

# TIRËJ

## KOVARA ÇANDÛ Û PIŞEYI

Hejmar : 4

Sal:1981

TENGASIYA ME Û MEFERMENDÛ / Serxas ARDA

SERGIRANÛ Û KÊŞMEKEŞÛ / Mihemed QASIM

Ji Rojen BARNAS ( Helbest):

Berêz Hoto Hemoto

Asıwayi

Ezmandın

Helbet

ŞİFA BI XWEDÊ YE / Flit TOTANÛ

STRANA TE XELKÊ AZA WÊ BISTIRÊ /

Mirza İBRAHİMOV

Du Helbest Ji Tosmê REŞİD

Menya jina mın

Madi hişyar bû

NAMEYÊN TIRKIYÊ / F.M.Helmut Von MOLTKE

ZAZAKÛ DIR PRONAV / M.BRİNDAR

ZARGOTIN /

FERHENGOK



# TİRÊJ

Hejmar : 4  
Sal : 1981

KOVARA ÇANDE Û PIŞEYI

têxistini

Pêşgotin (Daxûyani)	
Raberi.....	
Tengasiya Me û Mefermendi / Serxas ARDA.....	5
Sergirani u Kêşmekeşi / Mihemet Qasim.....	8
Ji Rojen Barnas ( Helbest )	
*Berêz Hato Hemoto.....	12
*Asıwayi.....	14
*Ezımandın.....	16
*Helbet.....	18
Şifa bı Xwedê ye / Flit TOTANÎ.....	20
Pırsêd Berevkırına Folkloru Sazbendiyê(Strana Kurdi) Nûra CEWARÎ.....	30
Ji Berken BEREH (Helbesteki ) .....	32
Strana te Xelkê Aza wê bıstre / Mirza İBRAHİMO V.....	
Du helbest ji Tosine REŞİD	
*Menya jina mın .....	42
*Madi hişyar bû .....	44
Nameyên Tırkiyê / F.M.Helmut Von MOLTKE .....	46
Gelavejên me: Siyehpûş .....	49
Ji Seyid QAZÎ ( Helbestek ) .....	50
Zazaki Dır Pronav ( zamir ) M.BRİNDAR .....	54
Ji Malmusanij Helbestên Zazaki	
*Ma çı wast .....	59
*Errik .....	61
*Deza .....	64
ZARGOTIN	
*Mendo .....	66
*Ha derbû .....	67
Zazaki Dır Vateyi Verinan (2).....	68
Ferhengok Kurdi-Tırki.....	72
*Zazaki-Tırki.....	88
Niqte Şani .....	110

KURDISKA FÖRLAGET/ÇAPXANA KURD: Stockholm - SWEDEN  
BOX 5034 163 05 Spånga-SWEDEN Tel: 08-117086 / COPYRIGHT: Kurdiska  
Förlaget- Çapxana Kurd/ Tryckt hos Kurdiska Förlagets Tryckeri- Dec.1981  
PRIS/BUHA: 20 Kronor. ISBN: 91 86146 041

## DAXUYANI

Geli xwêndevanên hêja,

Tirêj, beri niha bi salekê zêdetir, li Kurdistanê Tirkî yê ji sê meha carekê derdiket. Lê, jina wê ya Kurdistanê, pîr mixabîna bes sê hejmar domkir. Dema ku hejmara çaran wê derketa, cûntake leşkerî, li Tirkîyê hat ser kirdayetiyê û weki hemû rojname û kovarên pêşverû-çî Kurdi çî ji Tirkîew ji hat qedexekirin. Loma ji hoyên jina wê li Tirkîyê ne ma.

Piştî vê yekê, me hewl da xwe ku em bi hawakî jina Tirêjê bîdîn domkirin. Îro ev fîrsend ket destê me û hejmaraya vaye gihaşt destê wê. Ta ku ji me bê, ji îro pê ve ji emê jina wê bîdîn domkirin. Cardin wek bere wê ji sê meha carekê derkeve.

Loma ji hûn dîkarin hejmarên nû ji navnişana wê ya nû peyda bikin û çî daxwaz û ditinên we li ser wê hebin, dîkarin rêkûn vê navnişanê.

Bi sîlav û gramên me.

Çapxana Kurd/SWED

# RABERİ

Xwendevanên Berêz,

B1 vê hejmara çara ya ku dî destê we de ye, TÎREJ sala xwe ya yeki dîqedine , dî jîyana weşani de êdî pê davêje nav derçika sala dîduya. Sala dîduya û yên dîtîr; b1 daxwazîya xîzmet kîrîna jî pêşveçûna çandeya Kurdî ya demokratîk, l1 me gîştan pîroz be.

B1 ceweta salvegera sala yeki i TÎREJE, me dîvê bisteki rawestîna û b1 çavêki çavdêri l1 pey xwe binîhêrin.

Heta derketîna TÎREJE ; ç1 nivî Kurdi û nivî b1 zîmanek dîna, ç1 seranser b1 Kurdi(mîna HAWAR û AZADÎ ) rojname û kovar derketîna , lê lîxuser l1 ser warê çandê û pişeyî rawestîna, j1 wa na b1 tenê biye nesibê TÎREJÊ.

D1 her hejmari dî, TÎREJ l1 pênc hezar kesî belav biye, çar hezarê wê, her dî nav welêt de hatiye belav kirîna. Ev tê wê maneyê ku, j1 sê meha carek, pênc hezar kes keysa b1 Kurdi xwendîna j1 nû ve ditîna: B1 bend, b1 helbest, b1 çirok û h.w.d.

Wendoxê erjayey,

B1 na û mara çeharîna kîşîma dest dîra a, TÎREJ i ser ra xwîna yewîna qedênena, j1 yana weşani dî hîni gama xwî erzena zîfêla serra dîyîna ser. Serra dîyîna û serê bîni b1 waştîşbê xîzmet kerdîşê a ver şîyayîşê çandeyê Kurdê demokratîki, ma hemîni rê wa pîroz bî.

B1 ser dî ageyrayîşê ser ra yewîna (birîncî yîldönümü) TÎREJ1, gani ma yew vîstekî vînderîm û b1 çîmbê çavdêrki (gözlemci) xwî ra pey b1 ewnim.

Heyanî vejîyayîşê TÎREJ1 ç1 nîme Kurdkî û nîme b1 yew bîna zîwanî, ç1 seraser b1 Kurdkî (zey HAWAR û AZADÎ) rojname û kovar vejîyayê, la xuser warey çandê û pişeyî sero vîndertîş, nîyan ra nesibê TÎREJ1 tena bîyo.

Heryew ûmarî dî, TÎREJ1 panc hezar kesî ra vîla bîya. Tîra çehar henzarî, wela tî mîyan dî vîla bîy. No, yeno na ma'na kî, hîrê mangan (aşmî) dî yew ray, panc henzar kesî newe ra fîrsetê wendîşê Kurdkî diyo: B1 bend, b1 helbest, b1 çirok û.a.b.

Vîla bîyayîşê ûmara ye-

Piştî belav bûyîna hej-  
mara yekî, ev gotîna ecêbma  
yi jî Malatê, jî Îskenderû-  
nê gihîştîye redaqşiyonê :  
"Hela...hela!.. jî me tirê  
ku Kurdi bî tenê zmanê axaf  
tîna lî gunda ne. Wey wey...  
tê xwendin û nivisandin ji."  
Jî bilî vî, me jî kuşpene -  
yên ber siyên qehwan ev go-  
tîna bî lêvîlkîrîni jî bî-  
histin: "Yaho! îşte çîrok  
în, Şi'r î, masal î... ya  
nî çî ?...."

Em dî nav van hoyan(şer-  
tan) de derketin, dimeşin.

Tirêj dî ware çandeyî  
de, bê şîk ne armanc e, lê  
navgînekî(wasîtakî) girîng  
e.Navgîna xwedî derketîna  
lî çandeya welatê me ye. Bo  
netewekî bê xwendegêhên bî  
zmanê xwe, navgîna hindeka-  
rîya xwendin û nivisanê ye.  
Navgîna derkîrîni û hindav  
dayîna çandeya gelêrî ye, dî  
rîya demokratîk de ber bî  
hindava pêşveçûnê.

Dî nav salekî de me çî  
kîr û çî ne kîr ? Kîrînê  
me lî pêş çava ne. Ne kîrî-  
nê me, jî hîn tengasîyan  
tên ku, hun dê vana dî ben-  
da Serxas ARDA, ya dî vê  
hejmarê de bixweynî.

Dî vê hejmarê de:

Mamosta bî qariqaturan,  
rûpela dixemilîne.

Bendekî Mihemed QASIM ,  
derxîsûsa jîyanê bêserûberî  
de heye, divê bê xwendin.

R.Barnas, Malmisaniy, B.  
Bereh û Bahrem bo we helbes  
tên hêja pêşkêş dikin.

Çîrokên Flit TOTANÎ û

wînî dîma, no vatew 'ecêbmen  
de Melatî ra, Eskenderun ra  
redaksiyonî resa "Hela...he-  
la!...ma vatîne qey Kurdkî  
ziwanê qîsse kerdişê dewan  
tena wo.Wey wey...nusêno û  
wanêno zi..."Bêxey na, ma  
payedaranê seyanê seyanê qeh  
wan ra no vate bî lewqîrmîç-  
nayışî zi eşnavî: "Yaw! îş-  
te çîrok ê, Şi'r ê, estanek  
ê...yani çî?"

Ma nî hoyan miyan ra ve-  
jîyaym, şonim.

Tirêjî, warey xebata çan  
deki dî, bêguman armanc niya  
labrê yew navgîn(wasîta) a  
girîng a.Navgîna wayir veji-  
yayîşê çandeyê welatê ma ya.  
Qandê netewekî bê xwendegêh-  
anê bî zîwanê xwîb navgîna  
musnayışê wendiş û nîwîştîş  
î ya.Navgîna vetîş û hindav  
(yön) dayîşê çandeyê gelêrî  
ya, rayê demokratîkî dîr ver  
bî hindava aver şîyayîşî.

Yew serrî miyan dî ma se  
(çî) kerd û se nê kerd? Ker-  
dey ma vera çîman ê.Nêkerdey  
ma, asar tenganeyan ra yenê  
kî, şîma do niyan benda Ser-  
xas Arday dî, na ûmarî dîr  
bîwa nê.

Na ûmarî dîr:

Mamosta, bî karikaturan,  
rîperran xemilneno.

Jîyanê bêserûberî sero  
yew benda Mihemed Qasimî es-  
ta, gani bîwaniyo.

R.Barnas, Malmisaniy, B.  
Bereh û Bahrem y şîma rê hel  
bestê erjayey pêşkêş kardê.

Çîrokê Flit TOTANÎ û Mir  
za İBRAHİMOVÎ, vayê hewî û  
bermî cenênê.

Mirza İBRAHİMOV, bayê ken û kovanîyê dijênin.

"Çiyayê Kurdistanê" nameya Feldmareşal H. von MOLTKE, bî wergerandina ser zaravayê Kurmanci hat pêşkêş kirin. Divê hem ev name hem ji tevayîya pirtûkê bê xwendin.

Dî rûpela "Gelavêjên Me" de helbesteki SIYEHPOŞ ci digre. Helbeskarê Kurd Sıyehpoş, lî dora sed û pênci-du sed sal berê bî melatîya gund, lî Silivan(Silvan) jî ye. Derxîsûsa jîyana wî de weki dînê haydarîki(malûmat) me nin e.

Du helbestên Tosînê Reşid, û nîvisareki Nura Cewarî lî ser folklorî Kurdi jî hûn dîkarin dî vê hejmarê da bîbinin.

Nîvisareki lêkolîni, lî ser pronavên(zamîrên) zaravayê Zazakî heye, wê bîkêri têkîlpêbiran bê.

Helbesteki kevîni lî ser Dêrsîmê bî Zazakî jî Seyit Qazî hat pêşkêş kirin.

NIQTEŞANÎ, digel navên xwe î Kurdi tê pêşkêş kirin ku wê bîkêri her kesî bê.

Ferhengoka zaravayê Kurmanci bî teşekî ferehî jî A-B-C-Ç yê dest pê dîke, dî hejmara pêncî de wê D-E.Ê-F ci bigre. Ya Zazakî bî teşeya xwe ya berê didomê.

Bî giramên me.

TİREJ

Çiyayê Kurdistanê" (Koyê Kurdistanî) namey (mektubê) Feldmareşal A.von MOLTKE î, bî tadayîşê ser zaravaya Kurmanci pêşkêş biy. Gani him no name(mektub), him zi pirtûk pêro bîwanîyo.

Rîperrê "Gelavêjên Me" dî yew helbesta SIYEHPOŞî ca gêna. Helbestkaro Kurd SIYEHPOŞ qasê se wû pancas-dîsey ser rî ra ver bî melayeya dewî, Silivan(Silvan) dî jîyawo. De raqê jîyana yê dî sowbîna hâgidarey (malumat) a ma çînnâ.

Yew nîwîştewo lêkolîni (înceleme), pronav(zamîr) anê Zarava ya Zazakî sero esto, ku têkîlpêbîr(eleqedar) an rê bîbo.


Dêrsîmî sero bî Zazakî yew helbesta verênî Seyit Qazî ra amey pêşkêş kerdîş.

NIQTEŞANÎ(noktalama îşaretleri), bî nameyanbê Xwî-nê Kurdkîyan pêşkêş biy, ku herkesî rê lazîm bîbê.

Ferhengokê zaravaya Kurmanci bî herayey reydi A-B-C Ç' ra dest pey keno, ûmara pancîni dî ku D-E-Ê-F ca bigirê Ey Zazakî zey verê dom keno.

Bî giramanê ma...

TİREJ





# Tengasiya Me û Mefermendi

Serxas ARDA

Lı welateki mêtîngeh, ku jı çar ali ve, ber lı jıyana z-  
man û çandeya wi hatiye girtın; bı zmanê wi welati dı warê  
çandeya pêşverû -şoreşgêr de, dest avêtına weşandin û nıvis-  
kariyê, bı rasti bêseki (meslekeki) gelek dijwar e.

Nıviskarên ku dı wi wari de bıxebıtın, bıvê-nevê xwe dı  
tengasiyeki çarenin de dibinın.

Em nımûnê jı rewşa xwe bıdın.

Jı ber ku jı aliyê mêtîngehkarın, bı darê zorê ber lı jı  
yan û pêşveçûna zmanê me hatiye girtın; dı mışlaqa (paralela)  
vi de:

1. Zmanê me i gelêri hê qaçılê xwe i devoki ne çırandı-  
ye. Dı nav devokan de têveliyên (ferqiyet) fereh û kûr, xwe dı  
dın nişan dayın. Jı ber vê, hılbıjartına devokeki bo zmanê nı  
visariyê ne gengaz e. Nıviskar; jı nıviskariyê pê ve, dıvê ku  
têkoşına berbihev çûna devokan jı bıde geş kırın û pêş ve  
bırın. Rewşa têveliya navbera zaravayan jı xwe lı ber çavan  
e, ne hewceyê gotinê ye.

2. Bo pêvajoya berbihev çûyın û yekitiya navbera devo-  
kan, dûre jı ya zaravayan ne çê seri, mêtîngehkar bı zanın  
her tevgerên weşandinên bı Kurdi; hê dı destpêkahiyê de fetı  
sandine. Dı dawiyê de, bıvê-nevê dı nav welatıyên me de kurme  
hin bûyına xwendın û nıvisandına bı Kurdi ci ne girtiye, be-  
lav ne bıye. Çı bıgre xwendına Kurdi, luks an tışteki bı bêkêr  
hatiye dêrin.

3. Disa jı ber tuneiya pirtûk û weşanên bı Kurdi, an jı

ber kêmasıya wan, bîvê-nevê baş têgîhiştın û hin bûyına zmanî yê pênûsgıran, bî awayê ku dilê meriv bîvê, ne gîhiştiye kemala xwe: Mina pıtıkên şırşıhtı, kêması û jari, jî bêhemdi, xwe pîjî nav çavan dıke.

Digel van hoyan daxwazıya me; bo herkesi, nıvisandin e . Ango bî qasî xwendevaneki jî Hekarê, yeki jî Sêwasê, jî Qer-sê, jî Cihanbeylıyê jî bıkarıbe nıvisara me bixweyîne û jê serwest bıbe. Disa, gava ku nıviskareke me bixweyının çêja (le zeta) bî Kurdi xwendinê jê hılının, ne ku nıvisareke; Erebi , jî Farısı, jî Tırki tevlihev mına gırara gavana lı pêşberê xwe bıbinın û tu çêjeki arızı jê hılneynın. Ev nıvisar ne ku bitenê çêja Kurdi-xwendinê bîdê, lê digel vê çêjê ronahıya jî şebaka pêşveçûn û azahıya dınya gerdenaza jî raghine, çî rûska mefera jıyaneki bê mêtinkari, dı vêna (irada) wan de bî jene û şêna (qudreta) wan i cıvaki rake pêdarê.

Birûbawerıya me ya derxısûsa nıviskari, pişekari (sen'et-kari) û weşangêriyê ev e.

Mıxabın jî ber hoyên (şertên) gelemper, yê ku me dı sê da ringa de lı jorê berhev kırıbû, dı hoyên iroyi de; ev daxwazıya me, bî awayê ku dilê me divê pêk nayê. Lewra, bo nıvisarek nû, gava em dest davêjin pênûsê, tırkin bî dilê me dıkeve. "Gelo, derbareya (dı mewzûya) çı de bınıvisının ku jı aliyê pıranıyê ve bê xwendın?... ", "Gelo, ev bare (mewzû) dê jı pıranıya xwendevanan re gıran nın be?.. ", "Gelo em dı dewsa fılan bêje an bîwêjê (tabirê) de kijanı bıkar bıbin ku jı aliyê pıranıyê ve bê fêm kırın?... " û h.w.d

Hûn jı dıbinın ku, çı bıgre em hê dı gehineka zman hin kırınê de ne. Lı pey bêje û bîwêjên xwerû Kurdi, dı nav kevanekê (parantêzê) de; maneya wan i bî Erebi, Farısı an bî Tırki dıdın ku xwendevan tafılê jê serwest bıbin.

Tu kovarekiçandeyi nın e; ku bo bêje û bîwêjên dı zmanê xwe, dı her çela (nusxeya) xwe de ferhengok veqetine, bîweşıne. Belki dı dınya weşandını de Tirêj nımûneki yekta ye, dı vê xısûsê de. Ev ne jı ber gıran bıkar anına zmanê nıvisarı ye, lê jı ber xwe berpırsıyar dêrina hin kırın û belav kırına zmanê Kurdi yê lıxuser e.

Belê, bı armanca nıvisarek nıvisandinê, gava ku em dest davêjin pênûse, bı rasti me dırehıle, tırkin bı dilê me dıkeve. Lê ku xwendevanên me jı, bı gelemperi (umûmi) zorê bıdın xwe, bı hedarı û rıkoyı bo hin bûyına-bı bêje û bîwêjên xwezman, dest bavêjin Tirêjê, pari bılıvın; dı pêşeroj de wê bar û tengasıya me sıvık bıbe. Wê çaxê bê fıkarê kırına jı bıjartına bêje û bareyên sıvık wê Tirêj dest bavêje vekırına şebaka dınya çandeyi ya pêşvebır û felatıyê.

Dı hoyên vê tengasiyê de em niha dieciqın.Lê ev acıqan-  
dına me,em hêvidar ın ku wê bıbe sedemê bıcibûna zmanê nivî  
sari bı kûri,berferahi lı her heremı.Dı hoyê welatê me de  
bı tenê zman hin kırın û belav kırın ji,têkoşineke mezin i  
siyasi ye,mazmazka têkoşina siyasi ye.Me bı tenê bı kariya  
vıya pêk banıya,bo me serketıneki bû ku wê bı bûna kariya  
bextewariya me.

Em jê mefermend ın.

# Sergirani û Kêşmekeşi

Mihemed QASIM

Mırovên ku bî danina kevîrek an xiçîkek alîkariya bî-  
lînd bûyîna avahîya diwarê şarsaniyetê(medeniyetê) kirî-  
ne, bê şîk mırovên ku rastarast dî nav têkiliyên hîlberî-  
nê de bûne. Dî maneki de, şarsaniyet; bî hîlberinê dest  
pê kirîye û bî mîşlaq(paralel) bûyîna bî pêvajoya hîlberî  
nê re gîhiştiye gehineka dî heymana me i iroyin.

Hîlberin, beri her tişt giringahi serûberî serûberî û  
sergiraniyê dixwaze. Sarûberî û hîlberin, dî her wari û  
neqebî de dî nav hevûdu de ne, bî hev re ne. Hîlberineki  
bê serûberî, bê bername(program) tu car lî piya na mine ,  
pergala xwe ya têdeyi diherifine tine xwarê.

Ciyê ku serûberî lê tu ne ye, lî wê derê pirhevoka kêş  
mekêşiyê dafîka xwe vegirtîye, lî hêviya nêçîra cangîra -  
nan û zaxelan e.

Dî pergala kêşmekêşî ango dî pergala bê pergaliyê de:  
Tîştê lê tê fikirin, tê daxwaz kirin; jî aliyê bûyer û tê  
kiliyên rastlêhati, yaxurî an jî aliyê tîştên ne dî hesa-  
bê de tên gîjgîjandin, tên kîşkîşandin: ew kar na çê seri,  
ew gelş jî rîya bîşaftinê ve dişihite.

Mırovên dî heymana me, nemaze yê ku bo pêk anina per  
galek serfînaztîr dixebitîn; jî her kesi bêtîr hewcedarê  
jiyan û xebatek bî serûberî ne. Razan, rabûn, xwarin, xwen  
dîn, şûştin û paqîji, xebata bêşeyî(mesleki), xebata çan-  
deyi(kulturel), bîli bûyîna bî mal û malî û zarokên xwe ;  
divê dî nav fesala rojê, ango dî nav bist û çar saeti de  
pêk bê, bîqede. Lewra roj lî gerdûnê bist û çar saet e, zê

detır nin e. Jı ber vi qasi jıyana mırovên nûjen yên dı heymana me, lı ser saet, deqıqe û sanıyan hatıye dabêş kıl rın û bername vakırın. Karkêr, divê dı deqıqa xwe de bigıl hije ser karê xwe û dı wê deqıqê de dezgê xwe i xebatê bıl ger xe. Bo vi, gava jı malê derkeve pêwıst e ku dı deqıqa xwe ya dıyar kırı de derkeve, da ku bıgıhije otobusê, trê nê, an serwisê. Pışti rabûna navgina serwisê bıl deqıqekıl dereng gıhiştına wi ya cıyê jê rabûnê, dıbe semê şıhtına jı niv romızıya(yewmıya) xwe, ev dıbe sedemê şıhtına dez gê xebatê bıl ew qas saeti jı hılberinê. Bıl mışlaqa(para - lel) vê şıhtinê, hatınıya welati dadıkeve, ev daketın bıl çend qati dıbe sedemê hın daketınên dı warê dınê yê hılberin û pêşveçûnê.

Jıyana bıl serûberi, bıl bername, tevgera bıl deqıq bûyın bıl gelemperi kurmê arızı yê bajarvanıyê ye. Jı ber dı vıyahıyên(hewcedarıyên) hoyên jıyani yên dardingi(madi) prolêtar, jı qor û çınên dın yê bajarvanıyê bêtır bıl serûber û deqıq ın.

Her çıqas ne bıl qasi bajarvanıyê, bıl xêzên zırav û hûr be jı dı jıyana pesari de jı serûberıyek bıl xêzên stûr, lê ne bıl deqıqı, tê ditın. Dema krav, şûv rakırın û dugısın kırınê dıyar e. Lê dıbe ku ev xebat hefteki pêş ve an hefteki şûn de bê kırın. Lê tu car dı dema çandınê de çınin, dı dema çıninê de jı çandınıya hılberineki na yê kırın. Ne bıl mehan, lê bıl rojan an bıl hefteyan kareki pesari paş de an pêş ve tê avêtın ku hoyên iklimi dest bıdın: Şılı, qeşa, av dan an hışk bûyına bıl helekela rojê jı wi kari re ne be bend.

Lı welatê mêtıngêh û lı yên paşdemayi, gıranıya hılberinê lı ser hılberına çandını(zirai) ye. Jı ber vi, kurmê gunditıyê berfirehtır û gurrtır e lı ser qor û çınên cıva ki yên dınê. Fıkare û paxava mirovinan jı alıyê kurtayıya zeman ve çı bıgre qet nin e. Mıxabın ev kurm, dı nav hêzên rewşenbır û şoreşgeran de jı bıl gurrayi xwe dıde nişan dayın.

Ku nımûne dayın bıvê, jıyana me mina serpehatıya trênen Turkiyê ye. Deqıqe û sanıye lı wê bıhêlın, çawa ku dı kujan saeti de wê kujan trênan eksprês, lı kujan istasyonê be, lı ku derê be, an wê bıl berexêri bıgıhije ku derê ne yê zanin jı alıyê ajo û rêwıyan û şeftrên û heta Dengbarê Ragıhandınê, bûyın û çuyın û rabûn û rûniştına me i dı alıyê dem û deverê ve; ne jı alıyê mali û hevalan lê jı alıyê me bıl xwe ve jı na yê zanin. Mali nı zane ku dı fırlan saetê de malxweyê wê dê lı ku derê be, zarok nı zanın

ku bavê wan dê di kijan saeti de li malê be, malxwe ni za ne ku kevani di kijan saeti de dê şivê an firavinê bîpêje. Gişt spartiyê Xwedê ne.

Hun leqayi hevalê xwe ji Hesên tîn, pîrsa hevûdu dikin Hesên gelek kêfa xwe ji hevûdu ditîna we re tine. Bî milê we digre bî îsrar dibêje we: "Fermo, em herin buroyê an kargehê rûnên." Hun pêşiyê spasi wi dikin, lê hingi hun spas dikin ew yek car li pêşniyara xwe sor dibê. Hun pê re dîçin, nêzikayi bî cigehê wi didin, Hesên efendi li we dizivire: "Li min bîbûri, divê di vê saetê ez li bêvan de rê bîwama. Tu li filan derê rûnê, deh deqîqe şûn de ez dê bîzîvirim. Na çê çarîkî ez dê bêm, pîştî wi em dê rûnên bîaxafin. Axaftina me gelek pêwîst û giring e, ha!" Çarîk dibê çar seat, çavê we li rê dimine, vêca hun dev ji xwe berdîdî, dîkevîna taya wî: Gelo tiştêk pê bû, tiştêk hat serê wi?...

Na xêr, qet ber wi me kevîna, tu kulek ji pê ne hatiye. Hun ber xwe, ber zemanê xwe kevîna ku ji aliyê jiyana kêş mekêşiyê ve bî ava danûkan re hatiye bîecandîna.

Min gelek hevalên nas hene ku ji mêj ve dest avêtîna zman û çandeya Kurdî. Ji mêj ve ku dibêjim, ne karê du-sê salan e; ev bû neh-deh sal. Di destpêkê de xwedê gravî an li ser rêzman(gramer) an li ser gerhenga Kurdî û Tirkî di xebitîna. Bî guman pê birîna wan hevalên hêja ya wê demê, ev xebata wan di nav pênc-şeş mehan de dê bîqedîya. Pênc-şeş meh çûn li pênc-şeş salan qîrîsa bûn di sa ji tu hîlberînek serê xwe di mede der ne xîst. Yêna di destpêkê de wê rê rêzmanî hîlberîjartîbûn; hêdi hêdi hatîna ser ferhengê, hatîna ser roman nivîsandîna, hatîna ser tîyatroyê, hatîna ser çîrok nivîsandîna... Û ku hun li rewşa wan îroyîna dipîrsîna, gişt rexnegîrên gelek mezin îna di welatê me de. Ha, hun dê bêjîna çî nivîsandîna heta îro, gelo? Qet ber me kevîna, hînek jê bo dest bî nivîsandîna kîna, dîfîkîrîna û yêndîna li kêreki tûj digîrîna ku bo pê serê pênuşa(qelema)xwe vekîna.

Gotîneki me î pêşîyan heye, dibêje ku: "Znêkari dibê, lê ne bî dê û xwîşkan re". Em dê ji vîya bêjîna; rast e, bê serûbarî dibê, kêşmekêşî dibê, cangîrîna û zexelî dibê, an go dibê ku bîbe, lê ne ji yêna wek me re. Lewra em gişt bî serê bavê xwe sond dixwîna, bî çavê şoreşgeriyê li xwe dîna. Nîhêrîna, navê demokrat bûnê, navê sosyalîstiyê bes î xwe na bîna, doza felatîya çîna û welatîna dikîna, doza welge randîna pergala genî ya gerdûnî dikîna û di sa ji xwe ji gema bî serûberiyê da na weşîna.

Dem li pey xwe na zivîre, ji nû ve dest bî beza xwe

na ke. Pêvajoya pêşveçûni û ya tevgerên serxwerabûnên civaki nadin pey me meriv, li hêviya meriv ra na weste. Divê meriv xwe bigihinê.

Heymana me jîyan û xebata bî serûberî divê. Kefênê termê kêşmekêşiyê li nav mirovên xawêndar jî mêj ve rîziya, ne ma. Jî ber ku em jî welat û jî birûbawerîya xwe ya siyasî berpîrsiyar in, divê ku jî her kesî bêtir û pêgaveki zûtir dest bî jîyana bî serûberî bikin.

# Helbest J1 Rojen BARNAS

## Berêz Hoto Hemoto

J1 Rojen BARNAS

"Bûçım bûçım bûç qıdas  
"Serê bûçım çûç qıdas  
"Mêjyê bûçım pûç qıdas  
"Dına bûçım hiç qıdas

Bûçım, Hoto Hemoto  
Hebû lı peleyek nêz  
Şareza bû....şareza  
Bı dest û lep, cergebez

Berêz Hoto Hemoto  
Nımayê demoqrasi  
Kevoka aşitiyê  
Wekhevıyê dınasi

Dınasi ji gotın e?  
Ew şûnwarê qırase  
Dı warê azadiyê  
Pêşewaki mezin e

Berêz Hoto Hemoto  
Pele pele dıgeri  
Azadi belav dıkır  
Bı parsê vedıgeri

Parsek Hoto Hemoto  
Lı hember mêtinkari



Hember mêtîngêhkari  
Rojê gotarek dîda  
J1 bêjê wê gotarê  
Brûsk, çrûsk dîbarî.  
L1 gundekî Ostralya  
Ku yek bibûna Keya  
B1 hêvîya qrêdî  
Tafîlê têl dîkîşand  
J1 bona pîrozbarî

L1 dinê çend netewe,  
Çend gel û eşîr hene  
Têv j1 wî ve tên zanîn  
D1 deftera wî de ne.

Yek jê heye ku jê re  
Tê mîna gurêmanco  
Gava jê bê axaftîn  
Dîgre qolînc û sanco

Heke jîna wî hilde  
B1 şaşî navê Kurdan  
Saet lê na wewite  
Wê tafîlê bê berdan.

Bo wî, destê xwe dan hev  
Zanayên wî peleyî  
Navê Kurd vemalîştîn  
J1 ferhenga, wek leyî

Jê re navek nû ditîn  
"Etnîk" û "Etnîkîstan"  
Dîsa jî ku dîbîhist  
Bîhar lê d' bû zîvîstan.

Berêz Hoto Hemoto  
Hê jî azadixwaz e  
D1 warê azadîyê  
Şîretkîr e, nemaze.

Bûçîm, bûçîm qedîya  
Ax hejî, av kelîya  
Bûçîm rabû pêdarê  
Merbend û gem helîya

# Asıwayi

Ez,

Asıwayê ro-ava

xemgir û rûzer

Tu,

Asıwayê rohilat

beşerûk û dilgeş

Her êvar

Dı nav ewrên benexin de

Bı

lî bende-mayına te

diljar

reben

nexweş

Û keserkêş im

Lî pey te.

Bı zerketavê re

Êvar,

Konê kovanan vedıgrın dı dilê min de

Û bager,  
Bêriyê diguvguvinin  
Lî min.

Tu asıwayê rohilat î,  
bextewar

Ez asıwayê ro-ava me  
stûxwar

Dîl jî xwezîya hevghînê,  
Pîngar

dayî

û

Dî merbenda keserê de bê hedar.

## Ezımandın

Bı xêr hati "cumhûriyet"  
Û tu ji "demoqrasi"  
Kerem kın ser doşekê  
Tıfingê xwe bavêjın pincê diwêr  
Bı kês rûnên  
Ku hun birçine,  
Malhazırî  
Hêkerûn heye  
ku we bivê.

Hun zanın ?  
Jı kêfa re  
Kes ne ma dı gund de  
Bı hatına we, ew qas şa bûn ku  
Bı pesarê ketın gişt  
Teriqin...  
Te mirov, ne teba  
Û ne ji mırışka qûn bı zirç

B1 serê bavê we  
Seyê me i qolo ji  
Pêşiyê dranê xwe i pêşin siqiland  
Dû re

-Lingo b1 qurbana seriya-

Revi

Çû.

B1 xêr hati "cumhûriyet"

Û tu ji "demoqrasi"

Ku hun birçine

Malhaziri

Hêkerûn heye

ku we bivê.

Lê,

Hun dê bixêr

Kengê herin gelo ?

## Helbet

Ev ba ku ne leqe, helbet  
Helbet sedemeki wi heyê  
Pel, lî gulyê daran bê deng...

Helbet sedemeki wi heyê  
Qirin dî kalanan de lal  
Û hêrs,  
dî postê mêşînê de.

Vêna geli lî ku ?  
Şêna geli lî ku ?  
Ev jin, na yê kîşin bî rasti.

Ev jin na yê kîşin helbet  
Helbet, bî vi rengi na yê kîşin  
Dîvê  
Vên  
Şên

hêşin bîbîn

dî rîzîna

vê jinê de.

Dîvê Pel bî leqe lî daran

Qirin, jî kalanan derkeve

Û hêrs, lî çargavîyê bîde xarê

Bî vênî

Bî şênî

Bî serûber.

# Şifa Bı Xwedê ye

Flit TOTANI

Dıktor Xelil İbrahim Beg derbasi ber masa xwe bû. Peleki jı bloqa reçetê kışand, rahışt pênûsê, "Cembeli" nıvısand, di roka rojê avêtê. Lı alıyê çepê "R" ki bı dūvik i bı rişik, bı lê hinbūyın ũ bı lê rûniştına destan kışand. Ev "R" ya ha, ki zane belki ya sed hezari, belki ya pênc sed hezar ũ penc sed ũ yeki bû ku bı wê xêz kışandına hinbūyi dıhat kışandın lı ser pelê reçeta saya. Lı pişt Dıktor beg, du diplomê camekan kiri bı diwar ve daleqandi hebûn. Yek jê ya Fakulta Tıbê ya İstanbulê, ya diduyan ji ya pısporiya êşikên hundırin. Dı nav bera herduwan de ji disa nıvisaneki camekan kiri, bı tipên gır ũ bedew xwe pijı nav çavên seredanan dıkir: "ŞIFA BI XWEDÊ YE". Kêmasiyek tê de ne hıştıbûn gelo? Jı mın re wısa dıhat. Herweki; "şifa bı Xwedê ye el hukmi lilahlil wahidun qe har" an ji "şifa bı Xwedê ye, amin" Bı rasti dumahika wi: bı zelali, ne dıhat bira mın lê ji mın re her wısa dıhat ku kêmasiyek tê de heye.

Dıktor Xelil İbrahim reçetê nıvısand, bıni imza kır. Drê-ji mın kır, bı dengeki dilovani lê ji perda bılınd, gote mın:

-Van dermanan tafılê pêk binın. Nebi nebi bı derengi keve. Divê saet lê ne fewite.

Mın rahışt, reçetê jê stend:

-Belê ezbeni. Spas... Deynê me ezbeni?

Dıktor beg kurt biri:

-Hezar bes e.

-Hezar?....

-Belê ...belê hezar bes e. Hûn ne xerib ın.



Pırçûk bî canê mın ve hatın,mıyên dî canê mın de piş  
bûn,destê mın rehîlî.Mın rahîşt hezar lirayekî kaxızin bîja  
nāv dravên kaxızin kışand û danî ser masê.Diktor beg tafîlê  
bî tevgerêki hinbûyi,rahîşt kîr berika xwe ya rastê ya pan-  
taon.Mın baş bala xwe dayê,destê wî mîna yê mın ne direhî-  
lî.Ber bî derî meşîya,berî ku derî lî me veke gote me:

-Şîfa bî Xwedê ye.

Bavê mın bersiv dayê:

-Sedeq amentû bilah.

Diktor lî lawîkê dergevanê xwe yê dî salonê de fetilî:

-Dora kê ye ? Bla bê.

Lawîk bî dengêki kuşpene û rûşûştî bang kîr lî nexweş-  
şan:

-57 ! 57 ! Hejmara 57 ya kê ye ?

Zılameki tevi pireka xwe jî cıyê xwe rabû.

Ez û brayê xwe Cemil ketin bin mîlê bavê xwe,em derke-  
tin salonê.Zıyayê zavayê mın û Mirxanê pîsmamê mın çengi  
mın û Cemil kîrîn,bî zorê rahîştin herdû çengurên bavê me  
û jî me stendin.Em herdû bra ferekişîn.

Jî cem diktor rasterast em çûn "HOTEL KING" ê.

Otobusên Bedlisê jî wê derê ango jî Dıyarbekrê bî gelem  
peri piştî heştê êvarê bî rê dıkevın.Gava em hatin otêlê hê  
saet yek û nivê paş nivro bû.Nexweşê me,yê rûniştin û gerrê  
nin bû.Jê re vezelandin û razan dıva.Tekin lî pêrgingehê dî  
nihêri.Jî mêj ve me hevûdu dınası.Her çiqas bihatıma Dıyar-  
bekrê,lî vê otêlê dımam.Dî her hatına xwe de jî mın bexşişê  
ki hêja dıda Tekin ku bo hatına dî careki dınê de, bêtirîh  
lî mın bınihêrin,hay lî mın hebın.

Tekin odeki bergehferêh û hênk da me.Me nexweşê xwe  
bır,bî cih kîr.Bî pêşbira dermanên dî reçetê kîrinê,dakîşim  
jêrê.

Saet çar û nivê paş nivro bû.Dî xwêdanê de şilopîlo bû-  
bûm.Lî serê çaryana ber Mızgefta Nebi,şerbetfroşan tasên  
xwe î şerbetê bî zengîl lî hev dıxıstın û dıqırin:

-Ava sûsê,bavê mın...

Dengê yeki bî dengêki bilındtır dengên ditir dınixamt:

-Bavê Elo lî vê ye brê mın.Bavê Elo lî vir...

Bavê Elo navdar bû.Çend car mın jê ava sûsê vexwaribû,  
bî rasti jî ya wî jî dîl ava sûsê bû;bî bihna xwe,bî çêja  
xwe ava sûsê.

Miratên lingên mın bî mın re ne dıkişın.Dî vê helekela  
Tirmeha Dıyarbekrê de jî Deriyê Serayê heta Merkez Bankê,jî  
Deriyê Çiyê heta Deriyê Mêrdinê,jî ber Mınara Çarpê heta De-  
riyê Urfayê tu dermanfroş ne mabûn ku yek bî yek bî peyatî  
lê ne geriyabım.Bersiva giştan jî bî kurtebiri: "Tu ne... "

Bavê Elo tasa nû spi kîrî, jî bîlbîlîka kûpê şerbetê he-  
ta ber dev dagirt, drêjimîn kîr. Mîn rahişt tasa sîfîr, bîhno  
bîhno jê bî fîrkîrîni vexwar.

Westiyana mîn, ne jî rêveçûnê bû, jî hêrsa bû. Jî hêrsa der-  
man peyda ne kîrînê. Gava ku dîketim kîjan dermanfroşxanê; çî  
şagirt, çî osta çav bî reçeta destê mîn dîketim, herweki ku  
ez polisê nependî yê narkotîkê bîm û hatîbîm jî wan eroin û  
morfin dîxwazim wîsa bî mîrûzekî tîrş, bî awîrên çepel lî  
mîn dînhêrîn û bersîva neyîniyê dîdan mîn. Dî destpêkê de ,  
lî çend cîyan, ez dî xwe de ketim şîkê: Lî derva, lî ser came-  
kanê bî Tîrki "eczane" dînivîsî, lê gava dîketim hundîrê dî-  
kanê; beqalîye, etarîye çî bêjî tê de hebûn. Kûpên cam yê ko-  
lonya û lewenta vekîrî, marqa bî marqa, celep celep şîşeyên  
qolonya dî derekan de rêz kîrî, sabûnên bîhndar marqe bî mar-  
qe, cur bî cur, qavqavkên xemîlandî û gîranbîha, memîkên pîtî-  
kan celep bî celep, berdîlk û derpiyên pîtîkan, leystokên za-  
rokan yê ser avê û yê bejayîyê, qaz û werdekên naylon, bot  
û êlek û sîmidên avjenîyê, boyax, şe û fîrçeyên por, neynîkên  
pirekan, mûçînk, macûn û fîrçeyên dîranan, pêlavên lastîk yê  
sporê, destmal û pêjgîrên kaxîzin, podra, rûj, merhem û derma-  
nên bedewîyê, sutyenên pirekan...

Gava jî dîkanê, mîn dîsa bala xwe dîda camekanê, belê lî  
serê "eczane", "pharmacie" û bî tipên Şewnanî tîştêk dîn nî-  
vîsandi bû, bî maneya etarîyê de "parfümerî" fîlan lê ne nî-  
vîsandi bû.

Mîn lî ser hev sê tas ava sûsê fit kîrî, tasa vala dîgel  
heqê wî da Bavê Elo, zîvîrîm otêlê.

Gava ketim navdera oda bavê xwe, bî nûzîn, nalîn û nîrri-  
neki tevlihev, kîr bîrrebîr:

-Tu lî ku derê yî? Çûy kîjan cehenemê?

Mîn bî stûxwarî bersivê da:

-Çûbûm ku dermanan bîkîrîm.

-Te kîrî ?

-Na xêr, mîxabîm mîn peyda ne kîr.

Bavê mîn yek carî înrî, bî borre borr:

-Sîktîr be, jî pêş çavê mîn here. Warê kor. Meriv dîbê qey  
xweynê jî kerîka guhê te berdane. Bêkêrê, bêkêr...

Bî dengêkî gîramgîr:

-Bavo, ez xulam xwe me qehîrîne, ez lî gîştî dermanfroşê  
Dîyarbekrê gerîyam, lê peyda ne bûn. Ka qey bî destê mîn e, çê  
kîrîna dermanan ?

Cemîlê brayê mîn rabû pê, jî mîn pîrsî. Mîn dermanfroşê  
ku lê gerîyabûn yek bî yek jê re got. Ez frêqet bûm. Cemîl :

-Kek, tu çûy Rezan û Ofîsê ?

Bı şêleki ecêbmayi:

-Na ... Çıma qey lı wê ji dermanfroş hene ?

Cemil bersewa min ne da. Jı min reçetê xwest. Min ji nerma xwe de reçetê dayê. Ew û zavayê min rabûn çûn ku herin Rezan û Ofisê.

Kêrê lı min xıstina, wê dılopeki xweyn ne niqutiya. Rast bû, ez bêkêr bûm. Çawa dermanfroşên Reza û yên Ofisê ne hatibûn bira min. Lê ku Cemil û Zıya jı wê derê dermanan peyda bıkırına, wê rewşa min a dı ber çavê bavê min de çawa bıwa.. Hem nexweş e, hem kal e, hem jı bı gazın û lome ye. Heta Bedlisê, çı heta Bedlisê belki heta mırinê dê vıya lı rıyê min xısta. Dê bıgota "Te nı karıbû derman bıkırı, tu hê jı dibêji ez war ım ?"

Ez weşeki xweş lı cem bavê xwe rûniştım. Jı nişka ve bı daxwazıyek dijwar dilê min bıjiya cıxare kışandinê. Pısmamên min i Mirxan û Keleş lı balê bûn. Rabûm, dakişım salona lı qata xwarê.

Lı koşeki bı cih bûm. Min çayki xwest. Cındiyê me i Tatwanı bı çavê min ket. Min destê xwe jê re hejand, Cındi ez dıtım, bér bı alı min de hat. Ez rabûm piya:

-Bıxêr hati, tu û van deran ?

-Xêra Xwedê lı te be. Welahi hebek işê min hebû.

-Xêr be, işeki çawa ?

Dılê min û çûyına Alemanyayê heye, ez hatım bo pasaport stendınê.

-Te pasaport stend ?

-Na xêr. Ez dê hê nû seri lêxım. Lı hêviya Tekin ım; hın sergêjanıyên wi hene, bla jê vala bıbe.

-Çı peywendıya Tekin û pasaportê bı hev hene ?

Cındi dı binê simbêlan de bışırı û got:

-Ûsıf beg, ma peywendıya Tekin û çı bı hev nin ın ku? Nı ha ez ku rasterast seri lı şuba pasaportê xım, heta meh, meh û niveki dê bıawıqım. Lê bı navgınıya Tekin kesi nemıri heta roja çaran dê bıhev keve.

Serê min ne gıhişt vi kari, vi işi. Min tışteki ne got, lê dı mana serwext ne bûnê de min serê xwe hejand. Cındi bı alı yê pêrgingehê ve, serê xwe zıvart û nihêri. Dû re rabû ser xwe, gote min:

-Vê qasê bı destûra te.

-Hêvi dıkım, ser çavan.

Cındi ber bı pêrgingehê ve meşıya, lı ber pêrgingehê ew û Cemilê brayê min û Zıya leqayi hevûdu bûn, pırsa hevûdu kırın. Ez jı rabûm. Cemil û Zıya çav bı min ketın, ber bı min ve hatın. Bê axaftın serê xwe bı belengazi, bı mana peyda ne kırınê de hejandın. Min jı wan pırsi:

Çawa bû, we ew peyda ne kîr ?

Cemil:

-Keko welahi me dermanfroşên Rezan û Ofisê serûbinê hev kîrîn, mîxabin me tîştêk bî dest ne xîst.

Em hîlkîşîn jorê, cem nexweşê xwe. Mê nexweşê xwe lî hêvî ya Keleş û Mirxan hişt ku di saet nehê êvarê de bî otobusê herin Bedlisê. Mîn sê nusxe fotokopiya reçetê derxîst: Yekî da Mirxan, yekî da Cemil, yekî da Zîya û eslê wê jî bî mîn re ma. Mîn tafîlê Zîya verêkîr; ew dê biçûna Erxeni, Eleziz, Bingol, Mûşê. Ku lî wan deran jî peyda ne bîwana wê heta Wanê biçûna. Pîştî verêkîrîna Zîya, em çûn Deriyê Mêrdinê mîn Cemil jî bî teqsiyê verêkîr: Ew jî dê biçûna Mêrdinê, Stewrê, Mîdyadê, di ser Kercewê de bîzîvîriya Batmanê, di ser Bîşêri û Gurdêlanê de biçûna Sêrtê, jî wê derê jî biçûna Bedlisê. Sî wêrek, Ûrfa, Birecûk, Nîzip, Entap û heta Edenê para mîn dîke tî. Gava ez lî otobusê sıwar bûm tîştêki gelek xerib hat bî ra mîn: "Dî şerkariya peyda kîrîna dermanan de Qumandarê cepha Entab û Edenê... Ûsîf Şengalî"... "Qumandar" û "cephe" lî xweşa mîn ne hatî. Ez lê fîkîrim: Hîmmmm.. tamam ev xweş e; "fermandarê eniya ro-ava, an jî "fermandarê eniya Ûrfa-Entab-Edenê. . . . Ûsîf Şengalî "Lê rutbe? Mîn rutbê ne dit." General" bêjî çawa ne, hîmmmm ? Pîr bîlînd dîkeve ne wî sa ?

Rastîyek vî hebû. Dî sedsaleyê bîstî de, bajarek mîna Dîyarbêkrê de ku meriv hîn dermanên bîjûndariyê peyda ne ke û sırf jî bo peyda kîrîna dermanan lî çar alî, lî qesebe û bajarê belav bibe; ev êdî şerkariya di eniya berdest kîrîna dermanan nîn e, lê çî ye ? Ku di damezrandînen dewletî yê bî jûndariyên de di vê sadsaleyê de, ne bî bîni tunebî. Lê lî her derî serûmên mar û dûpîşkan qet jî bînitî ne bî, mîro - vên jî pêvedana mar û dûpîşkan bîmîrî, û ev rewş di rojnemeyan de bî qîreqîr bê nîvîsandî; navê vê kîrîna mîn, " ne şerkariya di enî ye, lê çî ye ?

Roja pêncê zîvîrim Dîyarbêkrê, lê bî destek vala û bî rûkî reş. Pênc roj; bî şevê û bî rojê pênc roj. Bî otobusê, bî mînîbusê bî teqsiyê pênc roj... Lî her qesebe û bajarî dîkan bî dîkan lî dermanfroşxana bî gerîne pênc roj... Bî bajarê xopan mîna Sîwêreg û Maraşê pênc roj... Bî berdest ne kîrîna dermanan pênc roj.. Bî bê xewî, bî westîyan û wînda kîrîna meferê pênc roj...

Lî Seyrantepê, jî otobusê peya bûm. Westîyan bî serê nî kulê bêvîla mîn girtîbû û mîn lî pey xwe bî gemîrandîni dîkîşand. Gevzîka kera hat bîra mîn, çî tîştêki xerib e ne wî sa ? Lê ez bawerîm ku tu kes mîna mîn î vê gavê bî rûmeta gevîzîne nî zane, kes mîna mîn î vê qasê bî daxwazîyek dîj-

war; gevizandinê na xwaze. Ax xwezila ne jî şerma jî mirovî nan bîwa, mîn bîkariya xwe têr lî vê rasta ha bigevizanda, dâ ku ev jan û sistî jî movikên dî canê mîn bîbriya. Jî nişka ve mîn xwest tevzîkî bîdîm xwe, lê tafîlê lê warqîlim ku ez lî garajê me û hawîrdorê mîn bî boşahiya mirovînan mîna pêlên dî deryayê dîkele. Jî naçari mîn dev jî vê daxwaziya xwe berda. Dengê bang kîrînê bî guhê mîn ve hat; lî aliyê deng hatînê ve zivîrim, Cîndî û yekî dînê bûn. Me kêfxweşî dî hevûdu da. Cîndî, hevalê xwe bî mîn da nas kîrîm; Elişanê Motkî... Lî Elişan fetîlim:

-Dî mîn bîbûre, welahî serê mîn ew qas gêj û ez jî ew qas westiyame ku ronahî dî çavê mîn de ne maye, jî ber wê mîn te nas ne kîr.

Elišan :

-Hêvî dîkîm, ev çî gotînin ? Ma ez te nas na kîm qey.

-E bîxêr û xweşî hati. Jî Alemanyayê kengê hati ?

-Welahî çî bîgre waye hefta mîn dîqede.

-Ya? Bî xêr hati. Hê nû dîçî Bedlisê, an jî Bedlisê hati?

-Duh jî Bedlisê hatîm, çawa.

-Xêr bû îşelâh ?

-Welahî hîn mark hebûn, mîn xwest hûr kîm, lê çûm kîjan bankê hûr ne kîrîm. Yê ku got; "lîsta bîhayê nû hê ne hatîye", yê ku got; "şûba me lî kambîyoyê bîyani na nihêre". Her bî awakî got.

-Te jî anî Dîyarbekrê ?

-Belê lê...

Cîndî gotînê jî berê hîlani:

-Dîlê Xwedê pê şewtî ku leqayî mîn hat. Heke na dê bî+ bîra Merkez Bankê, bî erzani bîfrota. Me bîr ba Tekin; baş bû jî bîhayê ferma(resmî) bî pênc lîra zêdetîr me pê da hûr kîrîm.

-Hela hela?... Tekin mark pê çî dîke?

Cîndî leqayî naşîtek hatîbû, bî xasûkî bîşîrî:

-Oho... Ûsîf beg, Tekin her tîşt e. Dravên bîyani dîkîre û dîfroşe. Herwekî, ez bûm ax û xwelî; Merkez Bankê jî jî deh dolari zêdetîr dravê bîyani ne dan mîn. Ez çûm cem Tekin mîn bî heftê hezari dolar û mark jê kîrî.

-Ha bera pasaporta te çî bû ?

Bî dîlgeşî bîşîrî:

-Ku pasaport ne qedîya, mîn dîkarîbû dravên bîyani bîkîrîya ?

Mîn rahîşt destê Cîndî û Elişan, xatîr jî wan xwest, şîqî tim bajêr.

Bî tîhbûyîneki dîjwar bî xwe ve hatîm, hîşyar bûm. Mîn lambê vêxîst saet neh û bîstê êvarê bû. Rabûm, bî lezûbez

mın dest û serçavê xwe şuştın. Mın serûguhê xwe da hev. Ji o dê derketım, peya bûm salonê. Çûm pêrgingehê, Tekin bî zılameki re bli bû. Çav bî mın ket, bî rûgeşi:

-Evar baş, ez beni !

-Evar baş... Bo Bedlisê mın dê têlefoneki hêvi bıkıra. Tekin bî tılıya xwe ya işaretê ve got:

-Sanıyeke ez beni.

Ji axaftına Tekin, zılamê ku pê re bili dibû dıktor bû. Mala dıktor dı tarıyê de mabûn, jı Tekin ampûlê elektrîkê dixwest.

Tekin bî dengeki nızım jê pırsi:

-We çend dıvê ?

Dıktor bî stûxwari:

-Ku gengaz be çar ... Ji kerema xwe re .

Tekin lı zıla hundır ya bang kırına garsonan xıst. Garsoneki hat, lı ber pêrgingehê rawesta:

-Fermo !

Tekin lê zıvırı, jı berika xwe pênc sed lirayê kaxızın derxıst, drêji garson kır:

-Bı lez, here çar ampûl bıke pakêt bine.

Garson rahişt dravê kaxızın kır berika xwe û dı deriyê otêlê yê derveyın de jı çavan nependı bû, çû. Tekin lı mın zıvırı:

-Dı mın bıbûre.

-Hêvi dıkım, mın dê têlefoneki bıxwesta jı Bedlisê re.

Tekin numeratorê gerand:

-Alo...

Lı salonê derbasi koşeki vala bûm. Garson dê çav bı mın ketıbe ku çend rojnameyên rojê ani, dani ber mın. Dûre bı en daze rahişt xwelidanka belûr bır vala kır, pışti paqıj kırıne ani dani ser masê. Bı pir û pergala hinbûyi ya garsoniyê vekışi. Mın jê çay xwest. Serê xwe bı giramgiri tewand:

-Ser sera ez beni.

Gonga kathıjmêrê ya dı salonê bı tıngineki zırav lı dehi dıxıst. Pêre pêre Erdal ket bira mın. Erdal parêzer (avûkat) bû lı Dıyarbekrê. Hevalê mın i fakultê bû. Me jı hevûdu gelek hez dıkir. Dı nav xortên Dıyarbekri de, ew xorteki gelek hêja bû; sergıran, zırek, bı şıpıl û dı dersan de jı gelek jêhati lı cızdanê xwe gerıyam, mın qertê wi dit, têlefona malê tê de nıvısandı bû. Rabûm çûm ber pêrgingehê; mın nımarê da Tekin bo lê gerinê. Tekin lı mala wı gerıya, mal derket lê Erdal ne lı malê bû. Pıreka wı lı yê ku lı Erdal dıgere pırsi. Mın navê xwe û navnişana xwe ya otêlê dayê, gava bı zıvırıya malê bla jı kerema xwe re lı mın bıgerıya.

Pejneki xain serê xwe dı biraninên mın de pij kır û bı

min keniya:

"-Heta iro tiştê ku lê geriyay, te kijani berdest kir heta ku Erdal bîbîni ? Tu heri ber ava Fîratê av dê li te biçike."

Nî zani, ev pejna min rastiyê an ne rastiyê digot min. Lê ji min re wisa dihat ku ji pitikiya xwe û heta iro min xwestibe çî tiştî berdest kim, ew bi destê min ve ne hatiye. Vêca tiştên min i ji aliyê min ve ku hatibûn berdest dikirin yek bi yek li pêş çavê min, mîna wêneyên di sinemayê de bi girani derbas dibûn û digotin min: "Lê em ?" Ew pejna min ta xain bersivê ji ber min hiltani û bi bişirandîneki stinazkir digote wan: "De siktir bin lo! Ji we, bi her kesî re heye, ma hûn ji xwe ji nimetan dibînin!"

Ez di navbera şerkariya van herdû pejnên dijber de bi saetan mam, hatim perçiqandin, hatim gemirandin, hatim gevizandin. Dengê Tekin ez filitandim ji vê rewşa ne xweş a Tekin diqiri:

-Yûsîf beg!... Yûsîf beg!... Têlêfon !..

Bi bazdan çûm.

-Ju ku derê ye ? Bedlis e?

-Na, Erdal beg li te digere.

Min rahîşt ahizê:

-Alo ... Ez Yûsîf Şengal, êvar baş Erdal beg. Çawani bîbaş i?

-Spas tu û van deran? Tu çawan i?

-Welahî qet ne pîrse. Tu zani, nîmara têlêfona Osman Beg û ya Nejat Beg yê me i eczacî li Îstanbûlê ji min re lazîm e, li cem te hebe xêra xwe bîdî min.

-Xêr be inşelâh ?

-Çî xêr, çî hal. Iro çend roj e ku bavê min ji satilcanê nexweş e, me anî ba Xelîl Îbrahîm Beg, lê ji Edenê heta Wanê tu der û dever ne man ku em lê ne gerîyan, me dermanan peyda ne kirin. Vêca ez dê telefoni Osman Beg Anqerê û yê Nejat Beg Îstanbûlê kim, ku heta sibê êvarê peyda kin; du sibe sîwarêmbî balafirê herim binim.

Erdal nîmarê telefonên herduwan ji da min, min li cem xwe nivîsand. Min spasî wi kir dî re ahizê dani çiyê wi. Min spasî Tekin ji kir. Tekin navê dermanan ji min pîrsî. Min reçetê derxist, ji reçetê navê wan xwend. Tekin gotê min:

-Niha tu ji bo van dermanan li van derayi ev çend roj ?

Bi kovani min bersiv deyâ:

-Belê wele, ji bo vana li van dera me.

-Çima te ji min re ne got ?

-Min dê ji te re bigota çî?

Tekin li zîla hundîrin xist, garsonêki hat. Tekin gotê:

-Ji mîn re wiskiyek bî qeşem jî dolabê. Yûsîf beg te çawa divê?

-Spas bla ya mîn jî welê be.

Tekin lo garson zivîrî:

-Du wiski bî qeşem .Jî ya skoç. Ahmed lî wê be Ahmed, ku Ahmed ne lî wê be, Necmî bîşîne.

Garson çû. Du deqîqe şûn de ew digel du pîyan wiski û garsonêki ve hatin. Tekin rahîşt reçetê drêjî garsonê dinê kîr:

-Ahmed ! Jî kerema xwe re here cem Şêxmûs, îşev dora mîn î şevê ye, bla van dermanan bîde te.

Ahmed serê xwe dî meqamê erê kîrînê de hejand. Tekin jî berika xwe du hezar lira derxîst, drêjî Ahmed kîr. Ahmed çû. Garsonê dinê pîyana wiskiyê drêjî mîn kîr, mîn ya xwe hîlanî lê dîqîrîka mîn de ne dîçû xwarê. Tekin pîyana xwe bîlîn kîr

-Haydê jî xweşîya te re, Yûsîf Beg !

-Jî xweşîya te re....

-.....

Pênc deqîqe şûn de Ahmed teví dermanan, ew dermanên ku reçetê de nivîsandibûn teví wan bî xwe, hat. Ahmed pakêtê drêjî Tekin, Tekin jî drêjî mîn kîr. Mîn pakêtê vekîr, tu têve- lî tê tu ne bûn, ew bî xwe bûn. Ez lî Tekin zivîrim:

-Ev çawa dibe ?

-Çawa, çî çawa dibe ?

-Dermanfroş dî Dîyarbêkrê de ne man ku ez lê ne gerim û mîn peyda ne kîr, jî bo ví Entab, Edene, Maraş, Meletye jî ber mîn ne fîlîtin..

Tekin gotîna mîn dî devê mîn de hîşt:

-Derman wîsa peyda na bîn ku. Tu zanî Yûsîf Beg, parêze- ri (avûkati) navgînekî dî navbera girtî û mahkemê de nîn e ? Ne wîsa ? Ê divê navgînekî dî navbera dermanfroş û neşweşan de jî hebe. Tu rabûyî bî serê xwe çûyî, te reçetê drêjî ewan kîrîye ; "ev derman hene? Derman wîsa na yê kîrin....."

Bera jî wîsa ha... Jî kerîti mîn aqîl pê ne gîhand. Ew qas sal, ew qas xwendin bereday çûye. Jî pasaport derxîstinê, jî kîrîn û frotana dolar û sterlîn, jî peyda kîrîna ampûlê e lektrîkê, jî danûstendîna wiski, marlboro; divê mîn bîzanîya ku derman jî peyda dîbîn, lê ; lî otêla me. Belbî benzîn û likîd gaz jî peyda dibe. Ax kero ax...

Berdest sibê, lî Bedlîsê jî otobusê peya bûm. Çûm malê , deriyê me vekîrî lî ser pîştê bû. Ew dê zû rabûbîn. Ketim ey wanê çend cîranên me î nêzik rûnîştîbûn, çav bî mîn bî ketin gîşt rabûn. Mîn lî bavê xwe pîrsî, Hecî Beşîr axa bî dilova- nî ez hembêz kîrîm û gote mîn : "Bla serê te sax be." Mîn bir pê ne birê: Hela hela bî çî dîbêje "bla serê te sax be" Ez



çûm ber nivîna bavê xwe, min şemla wi jî serçavê wi avêt. Çavê wi vekiribûn, li min dinîhêrin. Na... na... çavê wi vekiribûn lê nivîstibû, ne hişyar bû. Min ew hejand:

-Bavo... bavo... Min dermanan peyda kir, va ye min ew anîn.

Dî gotina min de tu tiştêki zîz tu ne bû, lê hejyan bî bî wan ket, gişt bî hev re girin. Li wan zivîrim:

-Era xêr e, hun bo çî digirin ?

Heci Beşîr axa hat, bî mlê min î rastê girt. Jî wi tirê ku ez dê bikevîm. Min dengê xwe der ne xîst jê re. Bî destek jî piştî min mîzda û pê re gote min:

-Bla serê te û merivê te sax bin, Ûsîf, ronîya min. Bavê te mir, brayê min.

-Ez lê zivîrim:

-Tu din î, jîr î ?... Tu na bîni ku min jê re derman anî ye ? Ka lê bînhêre ku çavê wi çawa vekirine, li hêviya dermanan e. Bavê min ne mîriye, çavê wi li hêviya dermanan qerî mîye.

Heci Beşîr axa dev jî min ber ne dîda. Bî herdû mlên min girt û li nav çavê min nîhêri:

-Ûsîfê min, derman bî Xwedê ye lawo, şifa bî Xwedê ye.

Bera rast e? Şifa bî Xwedê ye ? Çîma derman bî destê Tekin e, çîma şifa bî Xwedê ye, hîmmm ? Ku derman ne bî destê Tekin bîwa, wê gavê wê şifa bî destê kê bîwa gelo ?

Min ew qas sal xwend jî bereday bû, hê tê ne gihîştîm ku şifa bî destê kê ye? Nemaze şifa satilcanê: ya bî derman peyda kirîni bî destê ki ye, ya bî derman peyda ne kirîni bî destê ki ye?

Ku hûn bî rastîya wi bîzanîbî jî kerema xwe re, jî min re bî nameki bînvîsinî. Navişana min ev e: Xaziyê şerkarîya derman peyda kirînê li enîya ro-ava,.....Ûsîf Şengalî, Bedlis.

Li hêviya we me, jî bir me kîn.

## Nûra Cewari

Folklorê her gelekî hêza wî ya hunermendiyê ye. Kûrayî û firebûna gıyana wî gelî bî ber çawa tine. Nava folklorê da dirok, jin, rabûn, rûniştin û xeyseta gel dıyar dibe. Lewma jî berevkırın û çapkırına nımûnêd folklorê gelê Kurd pırseke pır giring e. Ew jî seva rojê me. Gava bî zora pêlavêjê (radyo) û dûrditnok (televizyon) roj bî roj çanda wan gela yêd ku welatê me nav xwe da perçe kırine, zora xwe lî çanda gelê me dıkın. Lî her çar perçêd Kurdistanê pır dengbêj peyda bûne. Yêd ku stranêd xwe ser bınaxa awazêd bıyanıya çêdıkın. Pıraniya van strana bona folklorê gelê me derbarê sazbandiyê da bıyanî û neban in. Awazêd van strana lî himber stranêd folklorî hê sıvıktır in. Bona fêrbûnê hêsan in. Van merca (şert) da roj bî roj nımûnêd folklorê me ya gıranbıha û kevnar e, bî çı awî em dıkarın lî pêş cihanê serbılind bın. Ew stranêd ha unda dıbin û jî bir ve dıbin.

Folklorê Kurda ya sazbandiyê pır şax û pır janır e. Na va wan şaxa da yêd dı nava lepên me da, ew folklorê gundıtiyê ye. Lî ku taybetiya sazbandiya Kurda û bî taybeti nav stranêd sedsaliya navin da baş têne ber çawa. Rojêd me da jî gelek gunda da bî wî teheri stranêd nû têne hırtın. Jî bılı şaxa gundıtiyê, usa jî şaxêd evındariyê, bajarıyê, olıtiyê û yêd mıtrıba hene. Ev şaxêd ha jî jî aliyê xwe da ser can ra parve dıbin. Stranêd destan, mêrani, diroki, liriki, şayi, şini, beytê sedsaliya navin û yêd dema me û stranêd govendê dıkevın nav şaxa sazbandiya

gunditîyê.

Kurd gışk stranêd xwe zanin û distirên. Lê gışk nîkarin ku wan stran rast û paqij bîstirên. Dema berevkîrîna strana, gerek e vê pîrsê jî bira nekîn. Helbet kal û pîrêd me folklorê baştir û paqijtir xwey dîkîn. Lî gel wan jî nîmûnêd kevntîr mane. Pîr baş e folklorê jî rûniştvanê wan gund û bajarêd biçûk bînvîsîn. Yêd ku dûri rêyêd me zî zî û pevîrêdana wan lî gel cîrana kême.

Tevî berevkîrîna nîmûnêd sazbandîyê gerek e usa jî bê ku, stranbêj kî ye? Jî ku ye? Çend salî ye? Çî karî dîke û jî kû derê hîni strana bûye? Eva pîrseke zanyarî û pîr gîring e. Dîvê stranêd her navçeyekê bî tehrekî bêne strandin. Ew taybetî pêwîst e dema ku nîvisar bîminîn. Bona berhevîrîna û çapîrîna folklorê Kurda ya sazbandîyê, karê lapi gîran û gîring e. Ew nîvisandîna nota e. Bona ku nota rast bînvîsîn, gerek e stran ser qeytana magnîtafonê bêne nîvisandîna û par bî par û hêdi-hêdi bêne bîhistîn. Dîvê sazbandî (dengnîvîs) ku deng(note) dînvîse bîkarîbe bî xwe stranê bîstîre.

Folklorê gelê Kurd dewlemend û bê ser û bîni ye. Em çî qasî bî tekozi, fire û baş ewê raberî gelên cîhanê bîkîn. Ewqasî nav û dengê gelê me wê hê bîlîndtir bîbe û wê bê tîr belav bîbe.

# Helbest

## Niha

Berken BEREH

Niha

l1 qûntara çıya  
vebûne nêrgız hevalo  
Û germıya rojê de  
kemiline rêvas  
qey em naçınê ?

zanım

d1 şıverêyan de rêveçûn,  
çınına soryas l1 terazına  
Û hijmartına stêrka  
l1 ser kulilka ji  
pırr xweş bûye.

Niha

l1 gunda  
dema kolanê ye  
dema zıbarê  
û dema dilana ye  
disa  
keç û xortên xama  
wê b1 hev re bireqısın  
wê l1 hev binêrın  
b1 çavên kovani  
b1 çavzêlki

Û wê kesera vexwîn, zanîm  
J1 nivê dilê xwe hevalo  
j1 ber giraniya qelen  
J1 bêgaviyê.

Niha

L1 bajara hevalo  
bihar e bihar  
dema şixul  
dema rakırına xaniya ye qat b1 qat,  
zani,  
Karkerên demsali pırr in vêga  
Kesên bê iş pırr in  
divê  
j1 bo destmızek i pak  
em j1 wan re nişandin.  
çekên karkêran  
qews kırın  
tevgırêdan  
û rêça prolêtari.

Lew

nıha

l1 gelek deverên dın ji  
d1 şer de ne karker û gundi  
L1 heber eniya mêtınghekari  
wek herın dilanê, dıçın mırınê  
b1 zanyari.

Niha l1 hêviya me ne hevalo  
l1 hêviya me ne hespên çargavi  
Lew ewr dibuhurın ji esman  
û çav dışkinın  
Stêrkên azadi  
Fermo !.....

# Strana Te Xelqê Aza Wê Bıstre

Mirza İBRAHİMOV

## Jı Wêjeya Kurd ya Sovyetê

Mirza İbrahimov, niviskareki jı niviskarên Kurd yê Sovyeti ye. Çiroka jêrin jı pirtûka wi ya "Rojê Wê Bê" -1954, bê destdayın û bê guhe -randın bı neqilkırına Qanadê Kurdo hatiye welgirtın.

Vekit (imla) bı temami yê xwediyê nıvisarê ye, bı tu awayi tışt lê ne hatın zêde kırım û jê ne hatine derxıstın.

Lı bınatara nepeniya çiyê nav şehêd Urmiye û Salmasê da Kurd Ahmed hespê şê xûdayi da sekinandinê. Hesp jı beza zû germ bû bû, lema jı geleki westiya bû, ne dıxwest rehet bısekine û pêşda dıçû.

Kurd Ahmed destgina hespê ser xweda kışand, lı ser zin zıvırı û lı piha çıvane nıhêri. Pênc deqiqa şûnda jı nepeniya çıvane suwarek lı ser hespê şê bı wıva derket.

Ew suwar Rehim-Axa bû. Ewı dilezand û ber Kurd Ahmed ra derbas bû.

Kurd Ahmed gotê: -Hêdi bajo, hespê bıgire, Rehim axa, jı bır hada hefrazê.

Ewı ancax hesp sekinand û hesp hêdi ajot ba Kurd Ahmed.

Rehim Axa bî razibûn û devken gotê:-Te rind hespê şê yavaş kır.Xwedê neke,weki hesp pê bihese, ku suwarê wê dîtirse, ewê esse ewi bavêje."

Kurd Ahmed bî nerm hesp tîmar kır.

Rehim Axa bî ken cab da, got:-Xelq rast dibêje " hesp gerek bêhiş be, lê fêrîz aqılmend be "

Rehim Axa kolosê şar û şemaqihê rîşî lî dorê pêçandi jî serê xwe derxist, bî destmaleke mezin xûdana xwe paqîj kır. Hergav kîncêd Kurda lî wî bûn. Lê bûn şalê hevirmiş , dilingê şal kırîbûn ber sapogêd drêj; arxalixê wî jî hevirmiş bû, êlekê wî qeytankirî jî jî hevirmiş bû.

Hespa nefesa xwe giran dikişandin, hêlanada lî pêga çû yêda hıldikişiyân û her yekê jî wan dilezand, ko peşiya hev bikevîn. Lê Rehim Axa seba xatirê hevalê xweyi Kurd Ahmedê mezin hesp paşda dıgirt û pey wî dıçû. Çaxê Kurd Ahmed eva yeka dît, hespê xwe sekînan û wana rex hevda ajotîn . Zengûyêd hespê wan car-carna lî hev dîketîn û dıkîrin zingini .

-Ha tu westiyayi ? Rehim Axa lî sertepe çıyê, lî tatêd steqiri nihêri û bî kubari got: -Diya mın ez anîme dunyaê, lî ser pişta hespê ez nawestim, kırê mın zine.

-Erê, pîraniya Kurda lî ser pişta hespê jî diya xwe dî bîn û dımırın. Bî fıkırdari Kurd Ahmed cab da.

Rehim Axa bî van weberava tîrê tê gotinê qara wî edeti yê ko Kurda hesap dıkın çawa mêrani.

-Jiyina koçeri û gerroki bî rasti jî Kurdara reşbexti-ke mezin e,- ewi bî xem got û zêde kır- mîletê ku rehêd dî rêj neke bîn erdê, dımire, dıçe û lî vê dunyaê eseriya xwe nahêle.

-Weki rêh û kokê têkîn bîn erdê, lazîme erdê bâcer bî- kîn, lî ser bixebitîn, qatêd wê wergerinîn.

-Ma ferastiya mîletê me bî vî şıxulira tune ?

-Helbet ferasetiya wî heye. Kurd xebatparêzîn, mêrxas û camêrdîn.Lê dest û pê wan girêdayine. Rehim Axa axır tu dızani ku nızaniya kevne rızı ya mîlkdarîyê û jiyina kalba va, ya êlbatî û malbatîyê nehêlîn, ku mîletê Kurd çavêd xwe vekîn û vê dunyaê bîbinîn.

Ewana dengê xwe biri û heryek xwe ra kete xıyalan. Bî teqıl sîmêd hespa lî kevirê rê dîketîn. Lî aliyê Rohlatê şebeqa sîbê vedîbû.Zomê karê xwe kırîbû bar dıkîn. Dengê meriya, qirîya zaroa û jına, ewtina sa, orina çêleka, kalî na pez tev hev bûbûn û jî dûrva dıhatîn bîhistînê.

Lî ber koneki keçeke dêrê sîpî sedefkîri û pılıkkîri lê, lî ber kûra ağır rûniştîbû. Ewê berê xwe jî dû dabû alîki, û bî kevçiki darinî mezin xwarîn dî sitilêda lî hev

dixist. Lı ber kon wusa ji runiştı bû jineke cıwana çavre  
şe golireş. Evê jinê guh ne dıda keseki, bıstan dıda zaroê.

Çaxê Kurd Ahmed rex zomêra derbas bû, ewi dengê sılavi  
bihist:

-Kerem kın, axano, werın, çakê vexun. Wana bê hemdi xwe  
hespêd xwe paşda girtın û berê xwe dı aliyê deng da kırın.

Kurd Ahmed qet meriki nas lı nav koma nêziki rêda ne-  
dit. Ewi eva têglifa hesab kır çawa edetê Kurda mêvanıyê .  
Ewi razibûna xwe da wan û xwest rıya xwe da here, lê ewi  
dit, ku meriki porsıpi û rûdirêje lı pêşıyê ber bı wan dı-  
hat.

Kalê jar bû û bejna xwe va ne bılınd bû.

-Selam Rehim Axa, -xan got, - Kerem bıke, peya be, nane  
ki me bıxwe.

Çaxê kalê nêzik bû, Rehim Axa zû zû ji hespê peya bû û  
bı xatır lı ber wi qûz bû, ew temene kır û destê wi jarık  
ji tavê qemılandi ramûsa.

-Selam şairê navbeng.

Kurd Ahmed wê sehetê têderxist, ku yê lı pêşıya wi se-  
kınıye, Hejar e, Şairê Kurda ye. Ewi zanıbû navdariya Heja  
rê Şair yê ko qedirê wi nav qebilêd Kurda da pır bû; Hejar  
emirê xwe dıborand lı ber tendûra Kurdêd İranê, Romê, Ira-  
qê. Hejar tevkari hemû çeşna û şabûna dıbû, lı ba cıvatêd  
şingırıda ew hemparê derd û kul û şabûna wan bû. Gelek ca-  
ra ew dıbû navçigare qebil û berekêd bı hevra dijminayî dı  
kırın û gelek cara ewi şerê bırakkuştınê şerpeze û betal  
dıkır.

Hejar bı xwe meriki belengaz bû. Dılê wi ser malê dın-  
yaê sar bû. Kurd Ahmed bihistıbû ku hebûna Hejar her kinc,  
tarr û hespê wi bûn. Ew bı suwarî nava Kurda dıgerriya lı  
tarê xwe dixist û gılıyê rasti dıgihande Xelqê Kurd yê bı  
desti.

Çaxê Kurd Ahmed hatıbû Kurdistanê, ewi gelek cara bı-  
histı bû kılamêd Hejar, yêd ko dengbêja û aşıqa ji ber za-  
rê hev dıgirtın, dıstran û wusa belav dıkırın nav xelqê  
Kurdêd azaxwez. Dı nav kılamada kula mılet a kûr, derd û  
daxwaza wi, xem û xıyalêd wi zor dıhatın axavtınê. Her mê-  
reki Kurd, her Kurd dı nav kılama da gılıyêd rasti ser xwe  
emirê xwe ê gıran, ser aqûbeti û bextê xwê reş dıbihistın.  
Dı nav kılam û starana da wana wusa ji dıbihistın, ku me-  
rîv hergav lezın û dıxwezın ber bı bextewariyê herrın.

Kurd Ahmed ji hespê peya bû û wusa ji minani Rehim Axa  
bı xatır çû destê kalê ramûsa.

Rehim Axa pırs kır: -Hejarê navbeng ji ku kerema xwe



tên ?

Ewi destê xwe ber bî axaki xurt da dirêj kîr û got: -Aha bibîn nas, ez Huseyn Xan verê dîkîm eylê.

Ew axaê xurt Huseyn Xan bî xwe bû. Emirê wi angoriçîl û pênc-pêncî sal bû. Kincêd rînd bî wi bûn. Kêfa Huseyn Xan ne bî ci bû, lê caxê ewî navê Kurd Ahmed bîhist, zor da xwe û kenîya.

-Mîn bavê te rehmetî nas dîkîr... Kerem bîke ba me.

Kurd Ahmed pîrs kîr: -Çîma ha dereng Xan bar dîke eylê

Xan caba pîrsa wî nede, berê xwe dî aliyê wan koçerada kîr, yêd ko kîncê Kurda lê, hîneki jî kon dûr sekîni bûn û hîviya wê bûn, çîemîrî Xan bîke ser wan.

-Destgina hespê bîgîrîn.

Wê gavê gundîki koçer revî ba wan, destgînêd hespa gîrtîn û ew alîki da bîrîn û gîrê dan.

-Kerem bîkîn, hema hînek şîr vexwun, -Huseyn Xan teweqe kîr û destê xwe aliyê xaliça nêzîka kon raxîstîda kîr û got: -De zû destexanê dayîn.

Gundiyê koçer zû-zû destxaneke bîçûk lî ser xaliçê raxîstî, jî xurca nan, hêk rûn û penêr derxîstî. Yekî jî ser kûra agir sitîl lîlda û şîrê germ, kîre stekana.

Huseyn Xan bî hêrs got: -Tu çî dîki! Beranê qer ser jê ke !

Kurd Ahmed got: -Ez zef razîme eva ne lazîme, baş dîbe, wekî em qewatîya xwe bî şîrê germ bîkîn û bîkevîne ser rîya xwe û herîn.

Lê gundiyê koçer nîkar bûn guh ne dîn Huseyn Xan, wana fermana wî anî serî, baran gîrtî bû jî. Paşê wan heywan avîte erdê û yekî jî wan qeme jî kalan derxîst û ser qîrîrîka wî rabîr û xûnê fişîn.

-Telaş mekîn, em aliyê berana da belengaz nînin, - Huseyn Xan xwerrazî got, -Kurrê Zarobeg Mustefa Beg bî kerîya beranê me dîxwe û qet razîbûn xwe nade me, lê hun bî ber beranekî dîkevîn.

Kurd Ahmed deng nekîr, ewî fehîm kîr, ku pîrs û pîrsyar wê dîha gurr bîkîn dijîmînayîya nav du qebîla de. Hîngê fesal keta şairê kal û ew kete nav xeberêd wan û got:

-Xan hîvidarîya xwe lî rastiyê û edaletiyê bine, taba te hebe, ewî got û berê xwe Kurd Ahmed da kîr û gotê: Derdê Kurda mezîn e, kurê mîn bîrînêd Kurdistanê kûr î. Bede-na wê kîrîne sê parçe: perçek muftexurêd Romê dîzêrînin, pa-rek muftexurêd Farsa, parçê sîsiya dîzêrînin mîlkdar û muftexurêd Ereba. Dijmîn gîrîr î, lê nav qebîla da yekîti tune.

Xan got: Yekitiya qebila wê wi çaxi bibe, çî çaxi her qebil nanê xwe bixwe; wi çaxi yekdengi ji wê hebe nav qebila da. Weki dest bi anizaziyê bike, yê dinê wê berav bibin û wi bîdîlinin. Pîrsa sereke ew e, ku ne aqil ne ji wê hesa nijadî li ba serwerêd qebilêd me hene.

Kurd Ahmed gelek cara rasti serekêd ha yê qebila hatîbû û fikîrêd wan bi wiva eyan bûn. Lê ewi diha rind zanîbû ku heta xanêd ha serweriyê li qebilêd Kurda bikin, mecal na bin, ku miyaser bikin, serxwebûna mîletê Kurd.

Huseyn Xan destê xwe ber bi rûyê şair da kîr û got:

-Ez bi namûsa xwe kîm, weki qedirê rûyê te ni bûya, mî nê tîştîk banîya serê Mustefa Beg. Lê ewê zû bîzanbe qewata mî, ez deh roja mohletê didim wi. Weki ew keriyêd mî bi şivana va venegerrine, xûnê birrêje mîna çema, ewê poşman bibe... Tu wusa ji wî ra bêje...

Çaxê kebab anin, ev xebêdan hate birrinê. Huseyn Xan legan de ber mêvana û got:

-Dest pê bikin, kebab xweş in, çaxê ew germ in... Wana hê çitîk kebab hîl ne da bûn, Huseyn Xan vegeriya ser xebêrêd xwe derheqa Mustefa Beg û got:

-Ew dijminê Kurda gurê devbixûn û, bavê wi ji wusa bû. Dibe tu wi nas dikî.

Kurd Ahmed, fehm kîr, ku Huseyn Xan dixweze, ku ew bibe terefdarê wi hemberê dijminê wi.

Xebera xerab li ser zîmanê Huseyn Xan bû, lê ewi girt û hêrsa xwe dani.

Kurd Ahmed bi fikîrdari li dûr nihêri. Ji vi cîyê ha dûr, yê ku ewi lê nihêri, nepeniyê ra gola Urmîyê ji tirêja tava sibê zer wusa dibiriqi, ku meriva nikarbû lê temaşe bike. Evê golê xunav dida wan bestêd dorberêd xwe, yêd ku gelek hasilê nan, êmiş, fêki û pîncar didan. Eva ci û warêd weten zarotî û berxotani anin bira Kurd Ahmed. Ewi mêla xwe tamam da ser bedewiya wetenê dêbavê xwe.

Hejarê şair ji ser xurek vekîşi tarr hîlda, hêdi-hêdi dest pê kîr tiliya xwe li ser têlê wi bir û ani. Dengê tarê wi te tirê, serhatike xem derheqa kul û derdê xelqê yê bêdermankîri da gîli dîke. Aşîq xwe windakîri û hertişt bir kîri, kîlam hêdi stra. Kîlama wi da dihat gîli kîrinê hîm derheqa şerr û cengê nav başqe-başqe qebilêd mîleteki da, hîm derheqa jîneke belengaz da, ya ku kurr û mîrê wê di van şerra da hatîbûn kuştinê û paşi wana ew mabû bê xwe di-xudan û bi tenê li ser Çiyayê wetenê xwe digerre. Gundîr yê koçer berebere dihatin bêdeng û kerrelal nêzîki kon di-sekînin. Bi dengê kîlama hêlan qerçîmokêd ser rûyê wan pehn dibîn, rêç û şopa qultiyê ser eniya wan wînda dibîn.

Kurd Ahmed berêda spartibû Rehim-Axa, ku ew xebata şîretiyê nav qebilêd Kurda da saz ke. Lema ji Rehim Axa hêdî ka jî ciyê xwe rabû û aliki da çû. Jî qelfa mêra du xulamêd Huseyn Xan dızıkava jê qetiyar û lî pey Rehim Axa çûn. Ew her sê berjêri newalê bûn, daketî jêrê û jî ber çawa wunda bûn.

Kılama Hejar berebere dihat guhastîne, têda qeydê şabû nê bêtir dibûn. Ew berebere gurr dibûn û ciyê qeydêd xema û kula dıgirtî. İcar Hejar stra derheqa mêrani û bêtirsîya ku Kurda, derheqa qebileke mêrxas, ya ku rabûbû pêşberî Xa nê xwe yê zolmkar û kudkudoki, yê ku pevçûn dıkir nav serwerêd qebila. Eva serborîna bî hêlanî dihat stranê minast raneke wusa, ya ku marş dani bira me. Bî fıkıra Hejarê deng bêj berstrana wê kılamê bî dengê guhdara bîhata ducarkirîne, bî van gılıya va: "bira bımire axaê zulmkar".

-De bese, lazîm em bilivîn, hela hê ne germe, -Xan bî hêrs got û jî ciyê xwe rabû.

Merivêd berevbûyî, ne razibûn, ku Xan stran lî ciyê temami dılovan da birriye. Ew bêdılı xwe berebere bela bûn.

Wê sehetê jî destexan hıldan, kon daxıstî, bar dan ser pıştas hespan.

Şairê kal tarr kire çente û qet carekê lî pışt xwe nenihêrî, lî ber bî hespê xwe lıngırî. Ewî bédeng hevсарê wê girt û destkêş kır û hêdi-hêdi hevraza hılkışıya hêlanê jorin.

-Aşıq xenci, -bî heyfk yekî jî gundiyêd koçer got.

Gışka berê xwe da wî alî, ku alıva şair çû. Çend merilez pey wî çûn. Lê qırıya Huseyn Xan ya hêrs ew dan sekî nandinê.

-Ez nıkarım wextê xwe vıra wunda bıkı, bilivîn.

Kurd Ahmed û Rehim Axa, yê ku hıngê vegerrıya bû jî, bî dılsarı xatırê xwe jî Huseyn Xan xwestî, lî hespê xwe suwar bûn û rêketî. Çaxê ew hıneki jî kona dūr ketî, Rehim Axa gote Kurd Ahmed :

-Tu rınd bî dek û dolavêd Xan hesıyayî, ez dıtırsıyam, mın tırê virr û derwe wî wê te bıxapın. Naha serwerêd qebilêd me, hım yêd xwendî, hım yê nexwendî, her tenê derheqa serxwebûna mıletê Kurda dıkı qırin... Lê bî rastî ew her ketıne ser xerrêqa wî şıxulî, ku hukmê xwe ser qebila dı destê xweda bıhêlın, -Kurd Ahmed gılıya hevalê xwe bî van xebera da birrîne.

-Lê xelqê Kurd ida dest pê kırıye, eva fehın kırıye. Weki te bızanbıya tehsıreke çawa zor hate ser xelqê, çaxê mın kıtêboka pêşın lî Mehabadê jî çend merivêd xwe nas jî qebila Şıkaka ra xwend. Naha lî Mehabadê Komeleke me zor

ya teşkilkîri heye, -bı kubari Rehim Axa got: -Hevalêd me lı wêderê fikirine lı hev binın û tertib bıkın "ewhalê ser xwebûna mîletê Kurd" ew dıxwazın wan kitêbokan neşır bıkın û bela bıkın ne ku bı tenê lı vıra, lê wusa ji nav Kurdêd Romê û İraqê .Axır lazıme em binın seri pırsa yembûna Kurdan û ya efirandına yekiti û serxwebû Kurdistanê.

Çaxê Kurd Ahmed guh dida wi, ew dıfıkiri derheqî wan hasêgehêd gumreh, yêd ku sekını bûn lı ser riya miyaserkırına daxweza Kurda. Gelekava eyan bû, ku eva pırsa meremê xelqê Kurd tebiyete ne hêsa ye. Pêşveçûnêd xelqê me rınd dızanın ku eva pırsa bê tıfaq, bê pevgirek, bê dosti û bê arikariya Xelqê İranê, Romê, İraqê ê zehmetkêş Kurd nıkarın aza bın. Bona serxwebûna û azabûna xwe lazıme xelqê Kurd bı wan re tevayî şerrbıkın him pêşberî dijmnê hundur, him ji pêşberî dijmnê derva.

Kurd Ahmed xwest fikirêd xwe Rehim Axa ra bêje. Ewi got: -Tariqê daniye ber me bernemeke gıran û dijwar. Hundur da nızamiya kevne rızî ya mılkdariyêye, merivêd mına Huseyn Xan ın, lı derva imperializmê İngılıs, Emerikêye, şovenis - têt Romê, İranê, İraqê ne. Ne rehetê ji nav lepêd van zevt karêd devbıxûn derxın û bıgıhının hev. Xelqê Kurd yê heşt milioni. Lê lazım em vê pırsê zelal û durust bıkın bo navê jiyına xelqê Kurd, bo navê pêşdaçûyına wi. Ū ya pırr baş e we, em dı hundurda dest pê bıkın, pıçbıkın eleqetiya nahâ ya nav qebila û bereka da û saz bıkın yekitiyê nav wanda. Dı vi şıxulida dost û hemkarêd me şirhelal û sadıq zehmetkê - şêd Farsa, Azerbeycana, Tırka û Ereban ın. Her tenê bı arikariya zehmetkêşêd wan û partiyêd wan pêşveçûn û demokrati mîletê Kurd dıkare azabûn û serxwebûna xwe bistine. Ewi wusa ji Rehim Axa ra gılı kır, ku çawa sınıfa serdesti qestı ka dijmnayiyê dıkın nav başqe-başqe mîlet. Sınıfa muftexu ra kırêd xwe bı wê rêzgotiyê dıqedine, ya ku hela hê çaxê impêriya Rımê dıhat gotinê:

" Ji hev cuda bıke û hukumiyê lê bıke." Weki Angliyaê eva rêzgotiya neda xebıtandinê, tu ewê bıkarbûya bı reata xwe çıl milianava tenê û tenê axatiyê lı koloniyêd bı niv mi-liard read bıke.

Rehim Axa berê ewlin bıhistın ev reqem û ji wan ecêb ma. Lê Kurd Ahmed serda zêde kır û got, ku sebebıke şerrêd naha xut pırsa koloniyêye. Pırsa dijmnayiya berêberin ya nav Almaniya, Angliya û Yaponiya ewi ani bira Rehim Axa.

Çaxê ew hilkışıyan ser nepeniya çiyê, wan dit, ku şairê kal suwarî dı pêgeke deng da lı rex şıverreda rê dıçû. Ew lı ciyê xwe sekının şair hesp rıkêb kır û hat ba wana.

Rehim Axa got: -Şairê şeref( bî nav) kerem bike, em herrin ba me. Kılama navbirri tu lî ba me tamam bîstire.

-Ê lawê mîn, -axineke kûr hate şair. Û evî got: -Kılama xwe tamam bîstirê, dijwar nine. Lê kê kılama mîlet a navbirri tamam bîstirê. Gelek merivêd mîna Huseyn Xan strana mîn nivida birrine. Eva yeka dilê mîn naşewitine, derd û kulêd mîlet dilê mîn dişewitinin.

Ber xwe neke, bavko-Kurd Ahmed bî inayî got: -Derdê dilê te wê bê dermankirinê, wê roja Kurdîstana aza û yekitî starana te bîstirê. Em hîvidar in, strana te xelqê aza wê bîstirê û hingê kesek nîkare starana wana bîde birrinê.

Tercîme û lihevanin jî Nivîsara Mirza İbrahimov "Rojê wê Bê" -1954

Şanek: Ev nivîsar jî alfabeya kirilîk hatiye derbas kirinî alfabeya latînî. Jî ber vê; dî deng û tipan, yê ne dî keys û fesala me de hîn kîlûkêmasî, xeletî çê bûn; dî me bîbûrîn. Tirêj

# Helbest

## Menya jina mın

### Tosnê Reşit

Ez dijim çımki  
Evê sedsalya bomba otamyê  
Hê dengê zarê sava dibihêm,  
Û daykê wane devê mırinê ancax filiti  
Yê jı bextewaryê

lê-lêne dinbın,

Ewan demê kurt  
Ku wanra lı hev tê heveki razên  
Xewnada govend, şaya divinın.

Ez dijim çımki  
Ew bawariye her dilê mında  
Weki bıçûkê iro tên dinê  
wê şêr nevinın

Û wê bı gulla  
Ça lı Mahabadê  
Zarê bê gune idi neji mırın.

Ez dijim çımki  
Herdu zarê mın  
Zarê kal-bava zımanê Kurdi  
gazi mın dıkın,  
Beyt-çirokê xwe  
Ser wan xastına tımê lı hev tinın  
Kofya kijana  
azayi xweşya Kurdistanêye.

Ez dijim çımki  
Lawêd wan mêrxas şêrepêşmerga  
Ku şaxêd Zozik serê xwe danin  
Dicêribinin  
    tivingê bava jî axê bılındkın  
Jî bava baştır nişanê bıgrın  
Stranê meşqê pesnê mêranyê  
    ezber hin dıvın

Ez dijim çımki  
Rengê sorî geş  
    Şewqa xwe davê Kurdistanê jî  
Û jî koxkê tari  
Bêpar bêçarê bî hezar salî  
    çavgırtî mabûn  
    derdixe meşqê  
Û rastya tazi  
    bê xemil-derew  
    dîde pêşya wan.

Ez dijim çımki  
Dengê stranê xweşyê û şayê  
    jî roja tê dibhêm,  
Yan na jîna mın  
    îdî çîra bû.

TOSNE REŞİD

12.5.1980s.

# Madi hişyar bû

Tosine REŞID

Dûyê kela Dım-Dım disa alav da  
Nevyê xanê Kurd, xanê Çengzêrin,  
Ewê koletî, belengazyêda ta naha mabû  
                  serê xwe hilda,  
                  dengê xwe berda,  
Tıvinga binê stêr veşarti  
                  disa zerp kuxya  
                  disa xûn rijya.  
Ew tendûreka doza azayê  
Ya çendik-çend sal  
Bibû jan singê Kurdistanêda  
                  nav dilda kelya  
                  hundurva teqya,  
Disa pêşmêrge nav çyada bû çiya  
Jı xaka welat  
                  disa bılind bû heta esmana  
                  mîna Lepzêrin  
                  wek pelewana.

-II-

Lê afionkêşê bî mejûyê hênîjî  
Ku serê wanda tenê çend sûrê  
                  Quranê hen,  
Ewê ser laşê hezar-hezara  
Xebatkarara hilkîşyan ser text,



Ça hezar sal pêş  
dîsa bî hovi  
wek gurê birçi  
Eriş birne ser bajar gundê me  
bî tank, bî "Fantom"  
bî top û reşaş,  
Ku parastîna azaya ronk  
Zaroya armanc û dilekê me  
bêşîka wêda bîfetîsinîn.

-III-

Madi hîşyar bû....  
Dûyê kela Dîm-Dîm dîsa alav da,  
Ağırê sori geş  
Seranser pêda Kurdistan hilda  
kır kûra ağır  
û nav kûrêda  
Pêşmerge Kawa-hesinkîrê nû  
Azayike ge wê hasıl dîke.

# Nameyên Tırkiye

F.M.Helmut von MOLTKE

Feldmareşal Helmut von Moltke, dı 1800 de lı Alman yayê lı qeseba Parchin'ê hat dinyayê. Pêşiyê lı Dani-mark, dû re lı Prusya ket xızmeta lejkeri ya dewletê. Dı berwara 1836-1839 de bı pıspori û mışawiri i lejkeri ket xızmeta Osmanıyan. Dı şerê Osmanıyan yê lı ser Kur-dan û yên dı Kurdıstanê de bı wezia mışawiri peyda bû . Jı Botan heta Sêwasê, jı Xerzan heta Nizibê lı Kurdısta-nê geriya. Serbûri û ditinên xwe bı nameyi jı heval û ho girên xwe i lı welatê xwe re şand. Pıştı ku zıviri wela-tê xwe, van namcyan berhev kır û weşand. Dı 1891 de lı Berlinê mır.

Nameyên Turkiyê, bı navê "TÜRKIYE MEKTUPLARI" bı wergerandina Hayrullah Örs dı nav weşanên Remzi Kitabevi de dı 1969 de hat weşandin. Pirtûkeki gelek hêja ye, divê her kes bixweyne.

Nameyên Turkiyê, keriyek jı diroka welatê me i nı-visandi ye. Dı pêşeroj de ku keysa me dest bide, me dı-vê em wı seranser wergerinin Kurdi û amadeyê bikêrhatina xwendevanên xwe bıkın.

Nameya jêrin, jı wergerandina Hayrullah Örs ya weşana Remzi Kitabevi i rûpela 187,188,189 hatiye wergerandin.

## ÇIYAYÊN KURDISTANÊ

Kela Seid Beg, 18. Gulan. 1838

Herweki tê zanin, imparatoriya Osmani; peleyên fereh di nava xwe de dihewine ku tu gotîneki Babîâlî lî ser van peleyan derbas na be. Bê şîk pêwîst e ku Padişah dest bî fethên nav dewleta xwe ke. Welatê çiya yê di navbera tixûbê Îran û Dicleyê jî, di nav van peleyan de ye. Di navbera vi çemi û Fîratê de heremekî fereh î bejî, bê dar û şafîreki wîsa ye ku; lî serê tu xanîkî ciwari tu ne ye. Çend kavîl, nişan di dîn ku mirovin dest avêtîne ava kîrîna ciwari bûyînê, lê Ereb bî çî awayî dibe bîbe bo ciwari bûyînan destûr na dîn, lî vi şafîrî ew bî tenê konê xwe vedîgrîn.

Lê jî Dicleyê bî derbas bûyînê re, bî xweşikayîyek dîl-ferehkîrî gaz û pal dest pê dîkîn. Û ev hêdî hêdî bî çiyayê bîlîndî ve dîgêrîn ku niha hêjî jî berfê raxîstîne. Pêşîye bî gêr bûna jî znarên bîrrek û geliyên kûr, dû re bî şîrşîrî derbas bûyîna di nav rêlan, dawî bî av dana baxça, mêrg û medreban; ev co û robar jî wan deran dîzên. Gaz bî berû û çînarî vegîrtî, deşt bî hêjîr, zeytûn, gûz û hînarî, bî qocên dêlîyan û bî şaxên zeqûman tîjî ne. Genîmê lî latên hîndîk kûr hatîye tov kîrîn, di axa sorereşî de berên xwe î zengîntîrîn dîde. Lî deverên ku mirovin tu tîştî ne kîrîne jî, xweza; mêrgên çav-dêlayî (muhteşem) û jî kulîkên bî mîl yonîyan rengî bî xeml û xêz dîafîrîne. Çî bigre her êvar, ewrên ku lî navsera çiyayên lî nêzîk gîhîştîne hevûdu; vana av dîdîn. Hesp, mîh, çêlek, bîzî jî yê serşetîrîn in (baş qalîte ne). Lî çiyê xweya kevîrîn lî navrastê peyda dibe û di çiyayan de wekî dînê çî xezînê dînê veşartîne, bî gumana mîn tu mîneralog hêjî lê ne gerîyaye.

Heke lî welatekî ku xwedîyê wan dewlemendîyan e, jî çarran lî sîsîyê wî ne hatîbe xebîtin û di vê rewşê de mabe, di vê sedemê wî; di perîşanîya gelî ya di rewşên civakî de, bê lê gerîn.

Kurd, hema hema jî her awayî ve bî dîjî cîranê xwe î Ereb e, Bî tenê di nijdevanîyê de zewqa herduyan wekhev in, lê di vî de jî di Ereb de bêtîrîn dîzîtî, di Kurd de jî alî yê şerkarîyê heye. Ereb; heke hoz bî wan re be, pêstûrîyê bîkarînin. Jî tîfîngê dîtîrsîn û bî hespên xwe î çê dîrevîn, dîçîn. Gund û bajêr xîrab dîdêrîn, hêştîr (deve) bo wan cîyê her tîştî dîgre û şêna (qudreta) rûnîştîna welatekî dîde wan ku; jî bîlî wan kes nî kare lî wê derê bîjî. Lî ber êrîşek jî dîl Ereb vedîkîşî dîrayîyên wîsa ku kes nî karîbe xwe bîgîhînê û jî ber lî tu alîkî wargehekî wan î tîmî

yê ku bê herîfandın û xopan kırın tu ne ye, keysa xesîrandı na wan jî ne gengaz e.

Lî hember vî Kurd jî ber dıvıyahıyên(hewcedarıyên) xwe cotkar, jî ber meyla xwe ve jî şerkar e. Jî vê sedemê gund û zevî lî deştê, kel û hesar lî çiyê ne. Bî peyati şer dıke, diwar û çıya siperê wî, tıfınga wî jî çeka wî ye. Kurd nişangıreki têr baş e, tıfınga wî ya kıldayi, bî xeml û xêz jî bavê jê re dimine û Kurd wî weki hevaleki xwe i kevıntırın dınase.

Kurdên vî heremî, bî pıranî mısılman in. Lê ber bî tıxû bê İranêgelek Mesıhi( fleh) yên Yaqûbî hene. Helışandına nıfûz û şênkarıyên(iqtidar) malbati yên lî vê heremê, herwe ki lî pıranıya alıyê dınê yê İmparatorıyê tê dıtın, bo Babiâli qet gengaz ne bıye. Bandêrıyên(hakımıyet) mezın yên begên Kurdan, lî ser merıvên wan heye.Beg, dı navbera xwe de şer dıkın, lî hember bandêrıya(hakımıyeta) Babiâli radıbın, jî bêş dayınê dırevın, jî lejker berhev kırınê re rê na dın û bo starıya xwe vedıkışın kelên xwe i ku lî çıyayên bılınd bo xwe çêkırine.

Serwerên gırıngtır: Begê Rewandûzê ku jî alıyê Reşid Paşa ve hat bındest kırın, Bedırxan beg ku nıha lî alıyê me şer dıke, Seid Begê ku qasek berê kela wî pêt bî pêt şewıtı û İsmail Begê Akayê ye ku Babiâli paşatıyê dayê, lê rewşa rastıtıya wî bî şık e. Seferên lî hember van began, her tım bî fedakari û bî xesarên mezın dıbın mal. Lî van deran şer bıha ye, lewra berdest kırına dıvıyahıyan zor e, qumbereki ku lî ser pıšta hêstırê jî Samsunê heta vê derê tê, bî zêre ki Lui lî ser me rûdınê. Bırcên mıstehkem, tevi ku bo lî hemberi topan ne hatine ava kırınê jî, lê jî alıyê arazıyê ve ew qas dı rewşek destdayı û lihevhati de ne ku; gışt 30, 40 heta 42 roj karıbûna dıberxwedın; dı vê navê de jî sedemê êş û revokıyê jî ordıyê gelek mırov kêm bûne, dağırtına çıyê wan jî ber ku bî zehmeti ye, wında kırın; qatek dınê bî şerpezeyi dıbe.

Harekata Kurd Mahmut Paşa bî awaki lihevhati derbas bûbû, bî gıhiştına topan pênc roj şûn de, kel; zor xwe spartı nê hat kırın, rewşa bıjûni(sıhi) ya qıt'eyan baş bû, bırdar gelek hındık û çı bıgre gışt jî Kurdên tevkar bûn, ev jî jî wındakırıyan ne dıhatın jmartın. Derdest kırına kelekı ewa pıçûk i çiyê ku nıha jî komeki kavıl pê ve tu alıyek wî ne maye, bo Padışah tışteki ku gırıng bê dêran nın e. Lê ev der jî nıqtıyên bıngıhın yê tevgerên dıberxwedanıyên lî hember Babiâli bû. Jî ber vî qası gırıng bûyına Seid Beg a-nına rê; bê awıqandın, destpêkırına berhev kırına lejkeran bo damezrandına du tabûrên redıfı nişan dıde.

# Gelavêjên Me

Sıyehpoş

Ey hebiba ger cehenem dafi bi, tu dane bi  
Sed qesem dê biçme niv de, ez bî qesda daneyê.

Mın qebûl e; xemr û saqi, dêr û zenar û senem  
Mın ne vêt secade û ewrad digel sed daneyê

Aşiqê sadîk ew e, ê ku lî rîya dilberê  
Ger ewî binîn bî kêr kîn, ne şkêned peymaneyê

# Helbest

## Dersim

Jı Seyid Qazi

Dersımı vera sona kare (1)  
Mordem ke sona ra Dersımı ser,  
cero yêno vencê şin û şıware  
Genu xo do dewursu sero, vanê:  
"zor o, zor o derdê cigera hare"  
Nê zalımunê dina xortê Dersımı qır kerdê  
cêr û cor kerdê tê vırare.

Dersimi sero mız û dıman o,  
Usar nawo ame, derdê ma rê pepûk û sosın  
gilê kowu ra niso bıwano.  
Kami zot dave pıro, va ke:  
"Mırodê pêrunê çım de bımano."  
Nê zalımınê dina ferman do, vato:  
"Dersim dı az nê mano ! " (2)

---

(1) B'ewni Dr.Şıvan, Kürt Millet Hareketleri ve Irak' ta Kürdistan ihtilali, Stockholm

(2) Kare:kerre,şıkte                      mız:mij  
Venc: veng                                      gilê kowu: gilê koyan  
qır kerdênı :qırr kerdiş                      zot: zewt  
tê vırarı :tê vırad, tê verıkı pêru: pêro, pyor, heme  
usar :wesar                                      mırod: mirad

# Helbest

## Vile Kurdan

Huseyin FERHAD

Serê şefaqi yo, roşn beno Rojhelat  
"Cendirmey yenê " va yew domani (1)  
Yew domani leheyf kaş kerd xwı sere  
Tuf kerd/ ard yew domani  
"Cendirmey yenê" va yew domani  
Yew domani, yew siy dekerdı qayışdê kelasungi  
Nışka ra berma yew doman  
"Berde lo" (2) va yew domani  
Şırr xwı bın kerdı mızza xwı yew domani

Tırki ra tedayox :Malmisaniş

- (1)- doman:gede, qeçek (qıj-qıcek), tut, put (putek) ,  
leyr. / Tırki:Çocuk.  
(2)- Berde lo: Verradı lo.  
(3)- b'ewni, Yeni Türkü (Aylık Sanat Gazetesi), sayı:2  
(1 Mayıs 1978, sayfa:3)

# Helbest

## Pîşti-wan ferman u Talana

Bahrem D.

Ferman

Û nefil'am, mîn ditîn,

seferberlik

û talana, mîn ditîn.

û dî qîrnê bîsta de çadhêl- çarhêl

zîlm mîn ditîn,

celî mîn ditîn...

mîn tev ditîn.

mîn tev

lî ser axa xwe,

ferman

nefil'am

û seferberlik,

û dûra xerç,

û dûra bêş,

û dûra

keder

kul

û êş...

hê jî tême gîvaştîn.

hê jî lî çar hêla

birinên elemgîrtî

hê jî,

hê jî têne kolan.

û jan dîde kezêba mîn,



dilê mın  
diêşe.  
dı nav xelkê de dil,  
dı nav xelkê de perçe  
ma qey hindik e ?

Jina mın ev e.  
fermana ji bîbinım  
celi ji bîbım,  
û jı çar hêla de çarqırn-çarqırn  
bême dotın ji  
ne ez diqelım,  
ne ji ev ax...  
û wında nabe tahb,  
cad  
bı avê de nare.  
jı sedsala va dılopê xwinê,  
jı sedsala va  
keda bıharê  
ma lı ku gol dıbe ?....

em ê bîbinın  
nêzik-dûr.  
ger mızginek bê,  
ger xeberek reş,  
jı bareş  
jı izgoya,  
vebûna kulilkê çıya  
an ji hilkırına wan  
berêvarek bıhari  
em ê bıb'hızın.....  
ez ê bîminım  
wılo bı evın,  
wılo bendi.  
û jı hêviya xwe tışteki  
bı serê qırşeki kêmaniki  
yeqın bıq  
wında nakım.  
yeqın bıq  
pışti wan ferman û talan.  
pışti wan êş û jana  
hê gelek bı hev re,  
hê gelek  
hew  
bo rojên xweş,  
hê gelek em ê bıjin....

# Zazaki Dır Pronav (Zamir)

M.BRİNDAR

Qısseyê k1 herrunda naman gênê, yini ra pronav(zamir) va jiyêno.Zarava Zazaki dır tewır b1 tewır pronavi estê:

## PRONAVE KESÎ

Zazaki dır pronavê kesi, b1 eleqedareya xw1 û lêkeran xw1 û lêkeran ow hevok(cumle) d1 cayê xw1(fonksiyonê xw1) rey ra bedelênê.

a)Zazaki dır yew grup pronavê kesi niy ê:

yekejmar

ez

t1

neri: aw,ay,we, o,yu(yo)

mayki: a, ya, aya

Kirdasi(Kurmanci) dır nerey û maykeya pronavê kesiyê hi rını(yekejmar) yew a.

Pronavê corêni verniya lêkeran d1 zî vajênê.Ma vajim:

neri

ez geyreno.....ez geyrena

t1 geyreni.....t1 geyrena

aw(ay,we,o,yu,) geyreno.....a(ya,aya) geyrena.

Pirejmaran d1 nerey û maykey zey yewbinan ê:

ma geyrenım(ma geyrenime,ma geyreni)

şıma geyreni(sıma geyrenê)

ê(yê) geyrenê

Çend xısusiyetê niy pronavan:

1)Zey naman ancênê.

neri

mayki

ez o.....ez a  
tı yi(tı yiy).....tı ya

aw o,ay o,o yo.....a ya,ya ya, aya ya  
Pirejmar:ma yim,şıma yê(sıma y),ê yê(yê yi)

2)Niy pronavi tay lêkeran dı tım û tım, tay lêkeran dı zi ge ge şuxulênê.Ma vajim lêkerê kı pey bı bınêkey ferma ni(emir kökü) viraziyênê bı niy pronavan ancênê:  
tı bıbirni, tı me birni, tı nê birni(tı nê birnê), tı do nê birnê, tı nê birneni?, eke(eger) tı bıbirni

3) Ne zi Demewo Nıkayın dı:  
ez birneno(ez birnena),tı birneni(tı birnena)  
Demewo Mandu(Paşeroj) dı:  
ez-hıma-birneno(ez hıma birnena)  
ez do bıbirno(ezo bıbirni)

4)Niy pronavi heme ca dır herrunda nami dır nê vajiyê-nê. Ma vajim kı kes nê şıyêno vajo "kıtabê ez"(Labrê kê şıyêno vajo "kıtabê mı".Tıya dır pronavê "mı" heze kı cêr dı nusiyêno gruba diyını ra wo).

5)Niy pronavê gruba yewını, hevok(cumle) mıyan dı nê be delênê, nê heremênê.

6)Niy pronavi, heme deme û kesanê lêkerê bıyayış(Kırda si :bûn) i dı vajiyênê.  
neri: ez bıyo, ez beno, ez bıbo, eke ez nê bo:.....  
mayki:ez bıya, ez bena, ez bıba, eke ez nê ba:.....

b)Gruba diyına pronavanê kesan zi na ya:

1.mın(mı)

1.ma

2.tu(to)

2.şıma(sıma)

neri:ay(ey),ayi(awi),adi(adê,adey),yê3.inan(ino),aynan(a-no),yêni(ini,yini,hi ni), jini,cini, dini

mayki:a,ya(yay),aya,ja,(jay),ca,da,

ada(aday)

Ma vajim:mı dı, to di,yê(ey) di/ya(aday) di

ma diym, şımâ diy(sıma di), aynan(yêni) diy

Niy pronavi zi:l)Demeyê Vıyarteyê tay lêkeran dı vajiyênê:mı şıkıt, tu şıkıt, yê(ay) şıkıt/yay(ja) şıkıt  
mı biran, mı bıbirnayni, mı birna bı(mı birnay bı),  
mı kı birna

2)Hevokan mıyan dı nê heremiyênê.

3)Wayırê tebay(yan zi milkê kesi) pey bı niy pronavan yeno vatış.Ma vajim:gayê mı(ga y mı), kalmay to(şımşêrê tu).

Niy pronavê corêni xwiser ê.Yani hergu yew, yew gisse yê.Labrê tayna pronavê kesi estê kı pey ra qısseyan ra

dussenê. Niy pronavi, peyniya qısseyan ro bestênê:

	<u>kesê yewını</u>	<u>kesê diyını</u>	<u>kesê hırını</u>
neri:	-o.....	-ı, -iy.....	-o
mayki:	-a.....	-a.....	-a
pirejmar:	-in, -ime, -ê, -i.....	-ê, -i.....	-ê, -i

PRONAVE NETAR

Pronavi estê kî nerey û maykey yan zi zafey (pirejmarey) û tayey (yekejmarey) a yini belli niya.

a) Pronavên lihevxiştî:

- |                |  |
|----------------|--|
| 1) pê          | 4) tıra, cı ra, pıra                   |
| 2) pey, piya   | 5) cê, cê dı, cê ra                    |
| 3) tede, tedir | 6) tê (jimnu, yewbinan, yewno)..û.a.b. |

b) Xwı: Niy pronavi ra pronavo rajê yan zi birdar zi vajı-yêno. Ca ca "xo" nê zi "xu" vajiyêno.

No pronav demewo kî yew pronavê kesi dima bêro, lêker (fiil), xwı bi xwı sero şuxulêno:

mı xwı şut (mı bi xwı, xwı şut). Yani yewbina kesi ez nê şuto). yê (ey) xwı dı.

Ni pronavi ra ver "bı" zı yeno. Ay wext beno "bı xwı (bı xo) " û pronavê hevduani (bîrleşik zamir) hesebêno.

tı bi xwı yı

Ge ge zı vajiyêno "xwı bi xwı (xo bi xo)". Ay deme zi kerdox (fail, özne) û biyaye (mef'ul), nesne) yew ê:

ma xwı bi xwı diy

yew yew hewı zı "bi xwı" kerdox o, biyaye zı "xwı"

beno. Ma vajin:

mı bi xwı, xwı eyşt (vıst)

mı bi xwı, xwı diy

PRONAVE NIŞANI

Qısseyê kî pronavê nişani yê, cadê xwı reyra ge ge zi rengdêrên nişani hesabêna/Demewo kî herrunda yew nameyê nawıti (işaret kerdı) dı xwı ser vajıyay pronavê nişani yê. Demewo kî yew nami ra ver vajiyê zı rengdêrê nişani yê.

neri-qandê nızdi: no (eno, ıno, heno), ni (eni, ını, heni), nê (ney, niy)

mayki-qandê nızdi: na (ena, ına, hena), nay (enay, niya)

neri-qandê duri: aw, ew, yu, ay

mayki-qandê duri: ya, aya, ada

neri û mayki pirejmar:

diyar (muxatab): nê (niy, ını, eni, eyni, heni) niyan (eniyan, ınıya, niyo, enyo)

nediyar (xaib): inan (aynan, ayno), awnu, yêni (yini)

Niy pronavê nişani zey lêkeran ancênê: ay i (tı ay i)

Pronavê Nişanê Cayan:

nızdı: tıya. İta, etiya, ewta(ıwta), wıta, inca(enca)  
duri: ja, wuja, wıca, ayca,ewra, owra,weyra,weyca

Pronavê Nişaniyê bini:

enawa(enwa), ina(ana,wını(huni), en tewır, eno cus(ına  
dıs), nawa, inhawa, niya, ona,inawa, inasar,enasarên:mi  
enasarên nê di.

ina hewa, honeyi, ûnawa

endi, ındı, hendi, ehendi, hendhey

ayawa, ay hewa, ayahewa, awa, ay tewır, ay cus(aya cıs)  
ay dus(ay dıs).

Niy pronavê corêni zi ca ca benê Rengdêrê Nişani yan zi  
benê Hoker(zarf)

PRONAVÊ ARRIZÎ

Niy pronavi semedê wayir bıyayış(mulkiyet) î ra vajênê:  
yekejmar-neri : ey(ê) / ey....o

" -mayki: ey / ey....a

pirejmar(neri û mayki): ey/ey.....ê(i)

Mıyanê dı nameyan yan zı vatan dı pêra bestox,neri rê:  
"-ê", mayki rê: "-a" beno:

welatê belengazan

Hesra Kurdan

PRONAVÊ PEGIH (GIREKÎ)

Vatey kı pê ra elaqedar ê, no pronav yini piya besteno.

neri: kı, ku, ay kı(ayo kı)

mayki: kı, a kı( aya kı:cenıya kı amey.)

pirejmar (neri-mayki): kı, enê kı,ayê(ayi) kı,adê kı

PRONAVÊ PIRSIYARÎ

neri: kam(kom), kami, kê

mayki:kamı(komı), kê

Niy corêni qandê ganiyan rê vajênê

Niy zi bêganen rê vajênê: çı, kam(kom)/kam(kom),kamcin  
(kajin), kamık(komık)

Ma vajim: Kami het o?, Kê het o?

Çiyê to?

(Tı) Çı yi?

PRONAVÊ NEBINAVKIRÎ (NEPENDÎ)

Pronavê nebinavkiriyê kı hina vişi vajênê niy cêrên ê:

yew(jew,ju, zu) yewer

wır yew, her yew, hergu

wırkes, hemekes, herkes

yewwek, yew kes, yewwer, kes, çew, çewwek  
heme çi, hergu çi  
çiyek, yew çi  
filan, filankes

heme, pêro(pyor), têdı, têdır  
tay, tûy, tani(tıra) yew  
tikê, tayeki, toyneki  
herçi, kam k1, kam keso k1  
çiyeki, çikesto, çikestê  
enwa(ana, ına, ona, wını)  
ayawa, ay hewa, awa  
çınd, çend  
yewbinan(yewna, yewbno, jımmu, zubini)  
filan û bêban(filan bêvan)

# J1 MALMISANIJ (Helbest)

## \*Ma Çı Waşt ?

-Mayan û piyandê şoreşgeran rê--  
B1 kilmey û raşte raşt,  
Ma kê ra çı waşt?  
Kê waştı rindey,  
xırabey kami waştı?  
Ma, xıraba kê waştı?  
Kami ma hetı diy şaşey  
û nebaşey?  
B1 kilmey,  
Ma zaf çiy nê waşt  
jina newa dir.  
Ma waşt:pizze, bê aw û bê nan/  
veyşan û teyşan  
nê mano...  
nêweş nêmano kes,  
nêmano nezan  
û bê cıl û belg/bê kincan  
bane û banqiliz.  
Ceni, bê mêrde/viya,  
camêrd, bê ceni/bê keye û bê hêvi  
qejek, bê mar û bê piy/seyek  
nê mano.

Ma va:gani,  
ganbo gani insan,  
nê verdiyo bê zıwan  
û zıwan,

bê elifba nêmano.  
Tuti, wa tena nêbibê  
embazê bızêkan û golikan,  
wa heme nêbibê şıwane û gawan.

Wa bıwerê,  
wa bıhewê, kaykerê,  
bıwanê û bızanê.

Welat dır, welat dır  
wa ceni nêkuwê  
û nêrê rotış.

Kamo k1 xebetiyeno ereqê çari reydi  
wa peydi  
bıgiyro heqê xwı peri reydi.

Wendey, wa nê roşê goniya xwıno  
roşna çımandê xwı.

Wa kes  
bê paşt û bê wayir nêmano.

Wa nêbıbo bê perr û bê bask.

Heme gel bıbo bıra,  
mêrdım pyero zerweş,  
çık esto fekweş,  
hergu yew dilgeş,  
weşş û war, weşş...

Bê çare û bê darû,  
nê mano teba  
nê kes/çıkkes.

Bawo sujê(!) ma gıran ê

bı waştışbê niyan.

Kuyayış û taqibat û zıندان

Bı kilmey û raşte raşt,



## \* Errik !

Televîzyon û rojnameyanê Tırkiya dı, se-  
rekwezir(başbakan) Demirel û wezirê tebe-  
ri(dışışleri bakanı) Hayrettin Erkmenî  
va: "Tırkiya dı işkence çınyo." -Heziran  
1980

Caman û rısman dı

Yev Baqani

-yani yew weziri, mine'l-wuzera-  
Xwı ver nê kewt, fekê xwı kerd hera  
B'ew tera

Riy xwı kerd siya,

bı rısiya.

Riy xwı kerd sıpi

Bı o-ri-sıpi

zey timoyın.

Cayan dı Awropa dı persay,

Vato: "No çı işkence wo?"

Zani, rispêney işkenci çınni!"

Baqani va:

"Tırkiya dı çido anasarên çınyo,

Ma hetı caran işkence nê beno kesî."

Va: "Tırkiya yew welato kı

Hurmetkarê heq û huquqê merduman o."

Zırt!...

B'erzı, tu veyno!

Ewro roj, rojê zurkeran o.  
 Heq û huqûk... peh peh peh!..  
 Errikey, errik?  
 Mezel ra werzî xortê PTT'i (1)  
 B'eqnawî Tahir Besem!  
 Tî kanca y Şakîro?  
 Lo Nazîf Kalelî, lo Bubi Eser!  
 Şarê Sêwreg û Ruha,  
 Şarê Wêranşehr.  
 Kolîk û Semsur(X)  
 Dêrîkî, Mêrdîn, Nîsêbin  
 û Batman, Diyarbekr  
 û Dêrsîm û ay bin...  
                     û ay bin...  
 Beşnaw û bî vîn !  
 Errikey errîkey errik!  
 "Riy siyay rî teney çî lazîm a?"  
 "Dêza va ez altunên o, kewndêzi va:  
           -la ez kura ra yeno?"  
 Bawkalan ana va wî dîma :  
 " Tî qayme tuf ki zîlbêlî, tî zîmbêlî, tî acêr tuf ki eriş a."  
 Ez vano:  
 anaw se,tuf kî xwî ver dî televizyoni  
           b'ew tedîr baqani.  
 "Serê çîwa gî,bînê çîwa rêxî."  
 Ma çîwa orte ra tepşîm.  
 Vîzêr, "Hukûmato bê şeref û zureker"(XX)  
 Ewro rîssiya û rêxîjin.  
 Mend meştî, mendi ma!

MALMÎSANIJ

---

(1) PTT-DER ra yew xort 1980 dî zêndanênê Diyarbekîr dî, pey bî îşkence kîşîya.

(X)kolîk: kahta, Semsur: Adiyaman

(XX) Seyîd Rîza demew kî xapîya,tepişîya xeneqîya, no va-te va.

û dejê bini k1 niynê vatış,  
waştışbê niyan ra yê.

Cêko ma zanim, bê lej  
niy waştışı niynê ca,  
nêkewenê dest  
rewa rew û leza lez;  
ma vazdenim lej ra lej.  
Gam bı gam, lez lez  
lezkani.

Bı enawa wazenim lej,  
yew lejdo peyen.  
Wa nêmano sazumano verên  
û keyen.

Bı adır û şewt im,  
ayo mowj.  
Ma bê vınd û tebat im,  
ze mojla,

Ma lejkerê welat im, têkoşerê felat im  
Ma leşkerê welat im.

Ma wegirim ni bar i,  
Dışmeni vergê har ê.  
Wa kes nêwro ni bari,  
Bê, ma teber ki'm şari.

Pank bıkerim ni wari,  
Wa wışk nêbê niy dari.  
Keyk1 çımsûrey qedıyay,  
Zordarey zi hewa niyay,  
Tir û brinê'm hedyay,  
Tir û brini hedyay.

Vazde bê bırak,  
Vazde, vazde bê bira!.  
Bê û b'ewni tıra,  
dezao, bê!

Tı kura yî, kura?

## \* Deza

Narbey leman  
Dezao!  
Velg û vişkoy daran,  
Lejg û şaxê xelfey gılan,  
    Koyan dır darıstan  
(Heze şarıstan dır mitıng).  
Bask dayişê tûr û gasarê meyban,  
    mıyan dı bencire û pêçekı,  
    xarzekan û rezan dır.  
(Zey nımtıki xebetıyayışê partizanan).  
Veri şıtıl, heze henek  
-İssot, balcan, fıringi-  
Dıma biy lemek  
    bostanan dır  
(Tı vani qey xwendekar i).  
Meys û moz,  
    karm û kêz,  
        mar û gormar  
        teber ra yaban dır  
        tıya ra heyani cawo cayên.  
(Kê vanê qey cendırme û polis ê).

Tıya ra  
    heyani cawo cayên delali'm!  
    Dezaym!  
Tıya ra heyani cawo cayên  
Herra ma kiho kali,kiho heway zıncarr i.

Ma tîmo hêvidar im,  
Ma wirro hêvidar i.  
Ma qey bîndestê şar i  
Ma qey tartele y şar i?  
Ma qey şîknenim zerbey beran  
û hewsar i ?

Sêwas ra heya Lorîstan  
                  heya cawo cayên-  
Ka wayir ma rê, deza datkeyna?  
La wayir vejê ma rê, xelkeyna!  
Lo wayir vejê ma rê, xaliza!  
Mebe maykî û mari,  
Vewra sûrî toro toro!  
B'ewni tî bî şari,  
                  herr û well bî to ro!  
Tî wayir vejîyê xwî rê  
                  karkerza, cîtêrza.  
Tern, nê wazeno wîşki  
Adır, nê wazeno aw  
Way û bîray, dayk û bawk  
Kes wa nê vîndo sîstki.  
Mî teterxan mekerê !  
Pêt kê rextanê xwî pêt,  
Bîşîdênê hêt bî hêt,  
Şêrê aver çut bî çut,  
Dîşmenan şarê ma kut,  
                  bîraza-bîrakeyna!  
Gonîba ma rîy xwî şut,  
                  warîza-warkeyna!  
Herra ma kîho kalî  
                  kîho hezey zîncarr i.  
Dîşmeni: mêtîngehkar i, kutîkzay  
Dîşmen: sermayedar o, kutîkza.  
Ma heme hêvidar im,  
                  eno mowj.

# Zargotın

## Mendo

Ha lêxe lêxe  
Ha wer Mendo tu lêxe  
Paniya gizmê l'erdê xe (1)  
Mefer Mendo tu lêxe  
Toz û dûmanê pêxe  
Ha wer Mendo tu lêxe

Îşev şeva baranê  
Govend geriya l' eywanê  
Vir de çûme govendê  
Ketme milê Şûşanê

.....(1)

Îşev şeva berfêo  
Govend gerya l' ehwşêo  
Vir de hatım govendê  
Ketme milê Sêvêo

.....(1)

Îşev şeva bagerê  
Govend geriya l' bêderê  
Vir de çûme govendê  
Ketme milê Dilberê

.....(1)

## Derbû

Ha derbû derbû  
Karwanê Hênê derbû  
Çil hêstir û çil ker bû  
Hestira pêşi b' semer bû  
Şemla gewra mın li ser bû

Ha bani bani bani  
Çil hêtir û çil canî  
Bî hêtira qeremani  
Malên me li mezrê dani  
Mezrê teng bû hil nani.

# Zazaki Dır Vatey Verinan

## DEWIJ

- 1-Da pizze y yeweri ro(yê ro), va :-Ay paştiya mı!
- 2-Darba kî kê bîdi xwî ro, darû y ya(ca) çînniyo.
- 3-Dawo mêrdimê yew tenî ro, vato:-Ay maney mı!
- 4-Dela kî boça xwî tê nê şana, kutîk dîma nê şono./Dela kî poç nê şano, kutîk dîma nê geyreno.
- 5-Delî sîpa bîbo, kutîk Bexdad ra yeno.
- 6-Delli rî heme roj roşan o/Delu y rê tîmo roşan o.
- 7-Dewmê hukmati derg o.
- 8-Desto betal(desto sîpi, desto rehet), pizzay veyşani sero yo.
- 9-Dest, desti serra esto.
- 10-Dest desti şone, dest ageyreno riy şone./Dest desti şîweno, dest ageyreno riy şîweno.
- 11-Desto kî birke bî tebşîyo, veyşan nê maneno.
- 12-De'wâ kî cuwen dî bena wa hêga dî bîba.
- 13-Dewa kî kê ra bî hasa(dewa kî kê veyno) kê ri rêber lazîm nîyo.
- 14-Deyn, huwateya şîno, bermiya yeno.
- 15-Deyn,mêrdey camêrdî yo.
- 16-Dêso to rî vano, veyvey bî eşnawî.
- 17-Dêza va:-Ez zerrên a.Kewndêzi va:-La ez kura ra yeno ? (la ez kura wo?)
- 18-Dêza va:-Ez zerrên o.Kewndêzi va:-Ez hetan şan tu mîyana geyrena(Ez ha tu mîyan dî).
- 19-Dî dîki yew sîloy sero nê veyndani.
- 20-Dî hebî hîndî nê debenê bîndê yew çeng i(poli).



- 21-Dı hindi bı yew dest nê tebişêni./Dı hindi yew dest nê benê.
- 22-Dişmenê kê, kê ri dost beno; dostê dışmendê kê,kê ri dost nê beno.
- 23-Dişmenê pêran dost, dostê pêran dışmen nê beno.
- 24-Dişmenê pırbavan kê ri dost nê beno.
- 25-Dişmeno camêrd(hewl, hol), kê kışeno zi, kê wedareno zi.
- 26-Dızd dızdeya xwı, puşt puştaya xwı kê ser nano.
- 27-Dişmeno camêrd(hwl), dostê teresi(xayini) ra başêr o . /Dişmeno camêrd hol o, sey dostê teresi.
- 28-Dızd dızdey dı, puşt puştay dı şeno.
- 29-Dina dı heme çi beno, erdişa(eyşa) kosi nina.
- 30-Dina yeweri rê(çewi ri) nê manena.
- 31-Dori, rayırdê awkı dı şıkıyêno.
- 32-Dost dışmen nê beno, dışmen dost nê beno.
